

Sadrettin Aydınlık pirsên me yên li ser Kongreya 5'an, rewşa kom û rêxistinên kurd û çepên tirkan bersivandin.

# 'ŞEREFA ME ŞOREŞA ME YE'


● Li ser guherîna awayê rêxistinê ya bi pergala (sîstema) serokatiyê jî, mirov dikare çend tiştan bibêje. Sekreteriya partiyê tenê bi serê xwe teng e. Ancax saziyeke wiha dikare bersivê bide, li gorî têkoşîneke wiha mezin. Ev jî nûtiyeke siyasî û sazûmanî ye. Nimûneke nû û ya pêşîn e. Mîna rakirina dasok û çakûç, guherîna sîstema sekreteriya partiyê bi pergala serokatiyê, hem ji bo mirovahiyê, hem ji bo grubên çep û hem jî, ji bo şexsiyetên sosyalîst nûtiyek e.

● "Hinek tiştên ku di dîrokê de bûne wekî nîşan, mîna dasok û çakûç; îro zêde feydeya wan nemaye, tu tesîra wan jî nîn e. Di cihê wan de, îro mirovahî çi dixwaze, welatê me çi dixwaze, ew girîng in. Tiştên ku emrê wan tije bûye divê ji holê bêne hildan. Di şûna wan de nîşanên ku îro tesîra wan li ser gelê me, li ser mirovahiyê heye, hewce ye derkevin pêş. Îro nûtî pêwist e. Li ser vê yekê ji alê, dasok û çakûç hatine derxistin."

Rûpel 8–9


# Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ | SAL: 1 HEJMAR: 37 | 30 TÎRMEH 1995 | BUHA: 40.000 TL(KDVD)

Di bin serokatiya İsmet İnönü de heyeta Tirkiye peymana Lozanê di 24'ê tîrmeha 1923'an de îmze kiribû.

Li bajarê Swisreyê li Lozanê Konferansa Navneteweyî ya Dîroka Kurdistanê çêbû

# Li Lozanê dîrokeke nû

● Enstîtuya Kurdî ya Berlînê, bi munasebeta salvegera Peymana Lozanê (24 tîrmeh), di navbera rojên 22–24'ê tîrmehê de li bajarê Swîsreyê li Lozanê konferanseke dîrokê ya navneteweyî li dar xist. Di konferansê de gelek dîrokzanên bi nav û deng, bi teblîxên xwe beşdar bûn.

● "72 salî berê di 24'ê tîrmehê de heyetên dewleta tirk û dewletên împeryalîst, ji bo perçekirina Kurdistanê, li ser maseyê peymanek îmze kirin. Lê îro kurdan bi konferansekê hem ew roj nirxandin û hem jî ji bo ji nû ve nivîsandina dîrokeke modern a kurdan, gaveke dîrokî avêtin."

Rûpel 2



## NÛÇE

## Greva birçîbûnê berfireh dibe

Rojiya birçîbûnê ji roja ku dest pê kir û heta îro, ji Washingtonê heta Moskovayê, li seranserê Ewrûpa û gelek bajarên dinyayê, bala raya giştî ya dinyayê dikşîne ser xwe. Li bajarên Tirkiyeyê û yên Kurdistanê hejmara beşdaran roj bi roj pirtir dibe, Li hêla din pêkutiyên dewletê jî li ser van kesan bêhtir dibe. Li Almanyayê êrîşên polîsan bû sebeba mirina Gulnaz Bagistanî. Li Tirkiyeyê jî girtiyekî PKK'yî Fesih Beyazçiçek di roja 10'an de mir li girtîgeha Yozgatê.

Rûpel 3

## Xanê û Xanî

Bi rastî jî, ji bilî Seydayê Xanî gelek hozanvanên kurd fekiyên wan zozanan in. Ji bo wê yekê tê gotin ku "Xanî" (Eşîra Xaniyan) hemû ji zikmakiya xwe şaîr in." An jî "Ew Xaniyê dengbêj nebe, ew ne yê babê xwe ye." Dihate gotin ku Xaniyan di nava hozanvanî û stranbêjiya devera Hekariya qedîm de cihekî girîng girtine.

Rûpel 12–13

## ZIMAN

## Herkes zimanzan e

Mirovên me hem siyasetvan in, hem zimanzan in, hem jî nezan in! Li gelek cihan, di civatan de, mirov dikevin qiriqa hev. Bi awayekî fanatîk, der heqê zimên de gengeşiyê dikin. Yek dibêje: "Bêşik ev gotina ku ez bi kar tînim gotineke kurdî ye", yê din dibêjê "Na! Ya ku ez bi kar tînim gotineke kurdî ye."

Rûpel 11

www.arsivakurdi.org

## Li bajarê Swîsreyê li Lozanê Konferansa Navneteweyî ya Dîroka Kurdistanê çêbû

# Li Lozanê dîrokeke nû

Enstîtuya Kurdî ya Berlînê, Konferansa Navneteweyî ya Dîroka Kurdistanê di 22–24'ê tîrmehê de li bajarê Swîsreyê Lozanê çêkir. Ji gelek welatan bi dehan alim, lêkolîner, dîrokzan, ji bo ku di konferansê de teblîxan pêşkêş bikin û biaxivin, hatin vî bajarî dîrokî. Konferans bi axaftina Serokê Enstîtuya Berlînê Î. Şerîf Wanli vebû. Wanli di axavtina xwe de li ser dîroka Kurdistanê û ya Mezopotamyayê sekinî û got ku dîroka îro, têrî rastiyên Kurdistanê nake. Serokê Enstîtuya Kurdî Wanli, li ser bûyina Konferansa Lozanê ya ku 72 sal berê çêbûbû rawestiya û ev got: "Lazim e dîroka Kurdistanê ji nû ve bê nivîsandin û nirxandin."

Ji bo konferansê Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan û Nivîskar Îsmail Beşikçi mesajên pîrozkirinê şandin.

Ez jî li ser navê rojnameya Welatê Me beşdarî vê konferansê bûm. Nêzîkî 50 kesî (semînerdar û mêvan) beşdarî konferansê bûn. Konferans ji heşt beşan amade bûbû. Kêmasiya konferansê ya girîng di warê wergerandinê de derket. Çend dîrokzan û lêkolînerên biyan û hinên kurd, tezên xwe yên zanistî bi zimanên biyan pêşkêş kirin. Wergêrên ku ev jî zimanên biyanî werdigerandin, ewil ji fransizî werdigerandin îngilîzî, dû re ji îngilîzî werdigerandin tirkî û ji tirkî jî werdigerandin kurdî da ku bê fêmkirin.

Konferans ji hêla demê ve jî kin bû. Ji ber vê yekê çend semînerdaran hê teza xwe baş nedidan fêmkirin, bi gotineke din nediqedandin, dem diqediya. Ev dibû sedem ku gelek pirs bêbersiv bimînin. Konferanseke wiha ya Navneteweyî (ku cara yekemîn pek tê) divîyabû ji hêla demê ve hinekî firehtir bûya. Mirov dikare vê ji bo pêş wekî tecrubeyekê bide berçav û jê îstifade bike. Di konferansê de yek ji tiştên ku bala min kişandin, semînerdar bûn. Semînerdarên ku navê wan di bernameyê de derbas dibûn û navên wan hatibû îlankirin, wekî Prof. Jamal Rashid Ahmed, M. Pitrus Karatay, M. Ayoub Barzani, Jacqueline Sammali û Martin van Bruinessen, beşdarî konferansê nebûn. Ji van semînerdaran tenê Martin van Bruinessen ji bo nehatina xwe lêborîn xwest. Ew semînerdarên ku navên wan li jor hatine nivîsandin, ne beşdarî konferansê bûn û ne jî tu agahî ji bo nehatina xwe şandin.

Di vê Konferansa Navneteweyî ya Dîroka Kurdistanê de li gorî min kêmasiya herî girîng, civîna çapemeniyê bû. Piştî "Maseya Gilover" civîna çapemeniyê li gorî bernameyê wê li Hotel Chateau d'Ouchy (cihê ku 72 sal berê yanî sala 1923'an de biryara parçekirina kurd û Kurdistanê hatibû girtin) bihata çêkirin. Em ji cihê ku konferans lê çêdibû derketin û gava me berê xwe da civîna çapemeniyê, di rê de me ji hev re got, "Niha gelek tv û rojnamevan hatine cihê civînê û em zû herin cih bigirin." Lê mixabin gava em ketin hundir me dît ku ji Welatê Me ez, ji Yeni Politikayê nûçevanek û TV–MED'ê jî ekîbek hatibûn. Ez bawer im ev organîzasyon nîşana kêmasiyeke mezin bû. Pêşniyaza min ew e ku gava konferanseke duyemîn bê çêkirin, di wê konferansê de kêmasiyên wiha tune bin. Lê ez ji vê yekê bawer im ev konferans çiqas kêmasiyê wê hebin jî, gihîştiye armanca xwe û bersîva 72 sal berê daye.

**Li ser konferansê kê çi got?**

Der heqê Konferansa Navneteweyî ya Dîroka Kurdistanê de, dîtinên dîrokzanan û semînerdaran:

**Prof. Dr. Pierre Lecoq (Parîs):** "Ez pir dilşa me ku beşdarî vê konferansê bûme. Di vê konferansê de hate dîtin ku mijar gelek in û gelek astengên li ber dîroka Kurdistanê, bi vê konferansê derketin holê. Ez bawer im li ser zimanê kurdî, li ser edebiyata kurdî, li ser dîroka kurdî, vê konferansê bi xwe re gelek dewlemendî anîn."

**Prof. Dr. Mahrdat Izady (Harward, USA):** "Ev konferans ji bo dîroka Kurdistanê pir girîng e. Heya îro konferanseke wiha pêk nehatibû. Lazim e em di gelek waran de hewl bidin. Ev konferans, ne tenê ji bo kurdan, ji bo hemû gelan tiştekî girîng e."

**Prof. Dr. Shakero Mihoyi (Moskov):** "Enstîtuya Kurdî ya Berlînê, xebateke girîng pêk anî. Ez bawer im konferans bi ser ket. Çawa hatibû projekirin û çi armanc hatibû danîn, bi dîtina min ew armanc gihîştin serî. Dîrok nanê siyasetê ye. Ez bawer im vê konferansê gelek nan da rêxistin û siyasetvanan."

**Dr. Cemşîd Bender (Îzmir, Tirkiye):** "Ji bo dîroka Kurdistanê ronî bibe û ji ber gelek sebebên din, ez bi xwe vê konferansê wekî tiştekî pir girîng dibînim. Îro di têkoşîna demokrasiyê de sê ling hene: 1.Şerê çekdarî 2.Dîplomasî 3.Têkoşîna dîrokê. Ez ji vê bawer im; gelên ku dîroka xwe nizanibin, nagihîjin serfiraziyê."


**Îsmaîl Göldaş (Stenbol):** "Ev konferans di dîroka Kurdistanê de cihekî pir girîng wê bistîne. Li gorî dîtinên min, di vê konferansê de hate dîtin ku dîrokzan, der heqê Kurdistanê de pir bi pêş ve çûne."

**Prof. Dr. Manuel Hasretyan (Moskov):** "Konferansa Navneteweyî ya Dîroka Kurdistanê bûyereke erênî ye û bûyereke dîrokî ye. Înşallah di salên pêşhatî de jî wê dom bike û ez hêvî dikim ku konferansên nû pêk bên."

**Prof. Îsmet Şerîf Vanli (Lozan):** "Cara yekemîn e di warê zanistî de konferanseke navneteweyî ya dîrokê pêk tê.



**Îsmet Şerîf Wanli**



**İsmail Göldaş**



**Cemşid Bender**

Ji ber vê yekê ew bi xwe, xwediyê dîrokeke giranbuha ye. Kurdan bi xwe hê dîroka xwe dernexistine holê. Ji ber vê yekê xebatên wiha gava bi dîrokzanên biyan, bi awayekî zanistî li ser bê sekinîn û li ser bê rûniştin, ji bo pêş tiştekî pir baş û pir girîng e."

**Dr. Ethem Xemgîn (Köln):** "Li Lozanê pêkanîna vê konferansê, bîranîneke dîrokî ye, bi gotineke din qonaxeke girîng ya dîrokî ye. Ji hêla din ve li ser dîroka kurd wêneyên girîng wê derkevin holê. Ev konferans ji bo me, ji bo dinyayê û ji bo rojhilata navîn tiştekî berbiçav e."

**Prof. Dr. M. S. Lazarev (Moskov):** "Ji bo ku di dîroka Kurdistanê de cara yekem e, ew çend jî muhîm e. Mixabin kurd dîroka xwe nizanin. Ev ji ber çi tê? Ji ber ku welatê wan çar parçe ye. Ez bawer im ev konferans wê bersivên gelek pirsan bide."

**Mesajên ku ji konferansê re hatin**

Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan, ji bo pîrozkirina konferansê mesajek şand. Öcalan di mesaja xwe de spasiyên xwe ji beşdaran re pêşkêş kir û got ku coxrafyaya Kurdistanê, bi neciha dîroka mirovahiyê ye. Serokê PKK'ê Öcalan, li ser rewşa gelê kurd û li ser tarîxa wan sekinî. Öcalan bi kurtahî ev got: "Xebata dîrokê, hem zanîn, hem huner (sen'et) û hem jî şoreş e. Tiştên ku hûn li ser dixebitin, ez wer bawer im, pêşiya me rohnî dikin. Ku haya me hinekî jî ji vê tarîxê tunebûya, me ewçend cesaret nedikir ku em li vî gelî bi xwedî derkevin.

Nivîskar Îsmail Beşikçi jî, ji bo konferansê mesajek şand. Beşikçi di mesaja xwe de got ku, kurd di nav kar û barê sazîbûnê de ne û dewlet bi terorê dixwaze rê li ber van avahiyan bigire. Mesaja Beşikçi wiha didome: "Di vê pêvajoyê de ihtiyac bi zanînê heye. Ji vê yekê gava rewşa Kurdistanê bê ber çavan, wê bê dîtin ku ev konferansên wiha, bi xwe re pêşketina hişê neteweyî û civakî jî tîne."

**ABDURRAHÎM AYAZ**
**Lozan/Swîsre**

---

## Guhertinên di Qanûna Bingehîn de ji bo rehetkirina rejîmê ye

Dema ku em guherînên di Qanûna Bingehîn de hatine kirin û şertên objektîv bidine ber hev, emê bibînin ku ji aliyê demokratîkbûnê ve tiştekî muhîm nehatiye kirin. Baweriya min ev e ku, rejîmê bêhtir bi van guherînan xwestiye xwe rihet bike, bêhneke baş bikişîne.Tiştên şeklî pêk anîne.

Bi ya min di vê qonaxê de, ji bilî guherînên di Qanûna Bingehîn de, qewmîna herî girîng têkoşîna di navbera hêzan (qewetan) de bû. Di nav hêzên serwer (serdest) de vê yekê, xwe eşkere da der. Vê guherîna ne kûr jî da nîşan ku, hêzên serdest ên Tirkiyeyê, guherînên ji binî ve û yên mayînî bi rihetî qebûl nakin, ji ber ku ev guherîn pehîn li berjewendiyên wan dide.

Her çiqas ev guherîn bi kêrî tengasiyên rejîmê bên jî û ji aliyê rewşa navneteweyî ve bikeve nava rihetiyekê jî, dikare bê gotin ku ev rûdan nîşanên jihevketina rejîmê jî didin nîşan. Heke gotin di cih de be, wê ev kêl birînê ranegirin.

Tiştê ku ez ji raya giştî ya kurdan re bibêjim jî ev e: Di dema guherîna Qanûna Bingehîn de ew rewşa tecrîtbûnê ku bi salan e tê jiyan, dîsa hate dîtin. Di vê navê de ku em hesasiyeta raya giştî jî bifikirin, bi hindikî be jî daxwaziyên saziyên polîtîk ên legal li ber çavan nehatine girtin an jî di vî warî de ev sazî pir bi tesîr nebûne, yek ji kêmasiyên herî mezin jî niha ev rewş e.

Ji aliyê me ve tiştê balkêş, ji bo demeke kin û navîn, guherîna madeya 84'an e. Bi vê guherînê re jî, wê niyeta rejîmê ya der heqê statuya nûnerên DEP'ê de jî xuya bibe û divê ev yek jî bê pirsiyarkirin.

Bi kurtî ez vê difikirim, bi van guherînan lê dixebitin ku rejîmê bihêvişînin (muhafeze bikin), bi vê yekê re jî divê neyê jibîrkirin ku "pêla ji binî ve tê" hêza iktidarê ji hev dixîne.

**Evûkat Selim Okçuoğlu**

JÛJÎ — Doğan Güzel




Di greva birçîbûne de du şehîd. Li Tirkiyeyê Fesih Beyazçiçek û li Almanyayê Gülnaz Bagistanî

# Grevên birçîbûnê berfireh dibin

Greva birçîbûnê ya ku ji aliyê girtiyên PKK'ê ve di 14'ê tîrmehê de ji bo bicihbûna aştiyê û sekinandina şer dest pê kiribû, li hemû welatên dinyayê, bi berfirehiyeke mezin, didome. Li aliyekî zêdeyî greva 10 hezar girtiyên PKK'yî didome, li aliyê din hem li Tirkiyeyê û hem jî li dinyayê gelek terefdarên rêxistinên çep û sosyalîst û kesên serbixwe, ji bo destekê ketin grevê.

Li Amedê, li navenda HADEP'ê 300 kes, di greva birçîbûnê de'ne. Li gorî agahiyên dawîn, polîs dora avahiya HADEP'ê girtiye û 30 kes jî binçav kirine. Ev 30 kes, dû re hatine berdan. Di nav 300 kesên ku di bin ablûqaya polîsan de, 20 heb zarok jî hene, ew jî ji ber vê ablûqayê birçî ne. Greva birçîbûnê li avahiya Hereketa Demokrasiya Nû (YDH) jî didome. Li Girtîgeha Amedê rewşa du girtiyan (Serhat Güllü û Mevlüt Ak) kritîk e. NÇM'ya Amedê jî daxuyaniyek da û diyar kir ku ew destekê didin vê kampanyayê.

**Li İzmirê 12 kes hatin berdan**

Di 25'ê tîrmehê de li İzmirê 15 lêzimên girtiyan li ber deriyê hepsa Bucayê hatibûn binçavkirin. Ji van 12 kes, di 26'ê mehê de hatin berdan. Her wiha greva ku li HADEP'a Konakê didome, ket roja 7'an.

Li Edene, Antalya, Meletê û Stenbolê jî grevên birçîbûnê didomin. Li Stenbolê di 24'ê tîrmehê de bi hezeran kes, li cadeya İstiklalê ya mezin ji bo piştgiriyê meşek çêkirin û piştî meşê li avahiya Partiya Yekbûyî ya Sosyalîst (BSP) dest bi greva birçîbûnê kirin.

**Li Ewrûpayê**

Li Almanyayê polîsan, di 26'ê tîrmehê de êrîşî ser kesên ku li ber Dêra Kudemê di greva birçîbûnê de bûn, kirin. Polîsên alman, ev êrîş di 5'ê sibehê de pêk anîn. Piştî vê êrîşê, polîsan xwest çadirên kesên ku di grevê de bûn, ji wan bistînin. Li ser êrîşa polîsan, ew kesên di grevê de bûn, dest bi meşê kirin û nêzî 10 km'yî meşiyan. Vê meşê heta qiyala nîvro dewam kir. Di dawiya meşê de jinek bi navê Gülnaz Bagistanî (40) ji bo ku 7 rojan di grevê de mabû, dilê wê zeîf ket û mir. Gülnaz Bagistanî diya 5 keçikan bû û ji Qosera Mêrdînê bû. Di eynî meşê de 4 kesên din jî nexweş ketin û niha li nexweşxaneyê radizên. Polîsên alman li gelek bajaran xwestin ku rê li ber vê kampanyayê bigirin, lê her car beşdaran, li ber xwe dan.

Li ser êrîşên polîsên alman, Partiya Sosyalîzma Demokratîk (PDS) û Keskan, daxuyanî dan. Di daxuyaniyan de êrîşa polîsan hate protestokirin û hate gotin ku ew bi kurdistaniyên ku li ber xwe didin re ne. Ji hêla din li Dortmund û Mannheimê gelek girtiyên kurd û yên biyan, ji bo piştgiriyê dest bi grevê kirin.


Gülnaz Bagistanî


Fesih Beyazçiçek

**Li Atînayê heyetekê Parlemento ziyaret kir**

Li paytexta Yewnanîstanê Atînayê, heyetek li ser navê kesên ku beşdarî greva birçîbûnê bûne, parlemento ziyaret kir. Heyetê, bi serokê Meclîsa Yewnan Apostolos Kaklamis re hevdîtinek çêkirin. Di hevdîtinê de heyetê ji serokê parlementoyê xwest ku tevgerîna li hemberî dîlên PKK'yî li gorî Peymana Cenevreyê be.

Navenda Nûçeyan


Malbatên girtiyan li Stenbolê ji bo greva birçîbûnê meşiyan.

## ...KURTENÛÇE...

### PKF bi mesajekê destek da PKK'ê

Partiya Komunîst a Filipînê (PKF) ji bo rojiya birçîbûna ya girtiyên PKK'yî mesaja destekê da. Di mesajê de hate gotin ku siyaseta dewleta tirk a resmî, dixwaze rê li ber hebûna kurdan bigire, lê kurdan bi pêşewaniya PKK'ê serkeftin nezîk kirine.

### PKD: Guherîna Qanûna Bingehîn makyajek e

Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt (PKDW), li ser guherînên ku di Qanûna Bingehîn de çêbûbûn, daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku meclîsa tirk, destî xalên der barê cuntaya 12'ê rezberê (îlon) de nedaye û û tiştê ku hatiye kirin, mirov dikare wekî makyajekê bihesibîne. Li gorî daxuyaniyê, heta meseleya kurdî hel nebe, li Tirkiyeyê tu mesele hel nabin.

### Mebûsên DEP'ê berdin

Raportorê Komisyona Karûbarên Derve yê Parlementoya Ewrûpayê Carlos Carnero, berî ku were Tirkiyeyê (13–17 Rêzber) Şêwirmendê xwe Stefano Squarcina şand, li gorî Şêwirmend Squarcina, ji bo ku Tirkiye têkeve nav yekitiya gumrukê ev guherînên Qanûna Bingehîn ne bes in û pêwist e mebûsên DEP'ê bên berdan.

### Li NÇM'ê Semînerên Sînemayê

Navenda Çanda Mezopotamyayê, (NÇM) di 26'ê tîrmehê de dest bi semînerên sînemayê kir NÇM, bi van semîneran hewl dide ku ji aliyê tarixa sînemayê, nivîsandina senaryo, kişandina fîlm û teknîka kamerayê, montaj ronahiyê ve, însanan bigihîne û bi grûbên biçûk, pratîkê jî bike.

### Li Dêrsimê 7 tîmên taybet mirin

Di 27'ê tîrmehê de li Dêrsimê gerîlayan êrîşî ser wasiteya tîmên taybet kirin. Di vê êrîşê de 7 tîm û 6 gerîla mirin û 10 tîm jî birîndar bûn. Ji hêla din li navçeya Mûşê li Hasköyê di navbera gerîla û hêzên dewletê de şer derket. Ji bo alîkariyê panzereke leşkerî tê mintîqeya şer û li ser rê diqulipe nav ava cem. Di vê bûyerê de 3 leşker, muxtarek û du subay mirin.

www.arsivakurd.org

Navê **5** kesên ku di xaçepirsa hejmara 35'an de peyva veşarî **'Vejîn'** dîtine û pirtûka **"Mişk û Mirov"** ya John Steinbeck qezenc kirine:

Eyüp Demir
Enqere

**Zerî Bazîdî**
**Stenbol**

Selehattin Kurt
Semsûr

**İsmil Özüak**
**Mêrdîn**


Zozan Can
Amed


# Kani Yılmaz tê îadekirin

Berpirsê Eniya Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê (ERNK) Kani Yılmaz di 25'ê Tîrmehê de li Londonê derket mehkemeyê. Di danişînê de heyeta mehkemeyê biryar da. Li gorî biryarê Kani Yılmaz, Li ser daxwaza Almanyayê wê bê îadekirin. Di eynî mehkemeyê de ebûqatên Kani Yılmaz îtirazî vê biryarê kirin, lê ji aliyê heyeta mehkemeyê ve ev daxwaz nehat qebûlkirin. Ebûqatên Yılmaz, di dawiya danişînê de beyan kirin ku ewê di nav 15 rojan de îtîraza xwe bibin mehkemeya bilind. Ji bo berdana (tahliya) Yılmaz, heyetek mebûsên partiya karkeran (Michael Fenny, Fin Goksil, John Austin Walker) Wezareta Karûbarê Navxweyî ziyaret kirin. Di vê ziyaretê de heyetê, nameyek ku tê de gelek îmzeyên ronakbîr û siyasetvanan jî hebûn, dan wezaretê. Li gorî heyetê, qanûnên Brîtanyayê rê li ber endamên partiyeke wekî PKK'ê nagire û Yılmaz jî ji ber van sûcan tê îadekirin.

Di saetên danişîna mehkemeya Kani Yılmaz de, li gorî ajansan zêdeyî 4 hezar kesî meşek li dar xistin. Li gorî eynî ajansan, polîsên Îngilîz mudaxaleyî vê meşê kiriye û 10 kes binçav kirine. Li hêla din 100 esnafên kurd ji bo protestokirina biriyarê, rojekê dikanên xwe girtin.

**Navenda Nûçeyan**






Av. Hasip Kaplan

# Ebûqat jî tê mehkemekirin


Dadgeha Ewlehî ya Dewletê ya Stenbolê (İDGM) der heqê Ebûqatê Partiya Demokrasiyê (DEP) yê berê Hasip Kaplan de, doz vekir. Hasîp Kaplan, li ser mehkemeya DEP'ê beyanetek dabû rojnameya Sabahê (8'ê berfanbara 1994'an) Li gorî dozgerê DGM'ê, Hasip Kaplan di wê beyanatê de ji prensîbên ebûqatiyê bi dûr ketiye û heqaret li DGM'ê kiriye.

Dozger dixwaze Ebûqat Hasip Kaplan û rojnamevana ku nûçe amade kiriye Evin Göktaş li gorî qanûna çapemeniyê bê mehkemekirin. Li gorî vê qanûnê, der barê Kaplan û Göktaş de ji 9 mehan heta 4,5 salan cezayê hepsê wê bê xwestin.

**Navenda Nûçeyan**




## XAÇEPIRSA BIXELAT (37)




PEYVA VEŞARÎ (1) (2) (3) (4) (5) (6)

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi riya pişkê (kura) li 5 kesan tên belavkirin. Xelata hejmara 37'an; kaseta **DILŞAD " Awazê kurdî"** ye.

**Jêrenot:**
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

**Xelata Xaçepirsê**




**Kapaxa "Awazê kurdî"**

## Îsraîl "Çivikên" xwe diparêze

Îsraîlê, 750 filistîniyên ku di dema şer de agahî dabûn wan ango ji dewleta cihûyan re sixurî kiribûn, birin nav erdê xwe. Rojnameya rojane Haaretzê da zanîn ku dewletê ji bo parastinê ew kes tevî malbatên wan, birine cihên biewle. Tê gotin ku Îsraîl naxwaze ku ewrastî êrîşên tolhildanê yên filistînyan bên. Rojnameya Haaretzê ku li Qudisê weşanê dike, dinivîse ku Îsraîl berî ku Perava Rojava bikeve bin destê filistîniyan, gelek hevkarên xwe ji herêmê dûr dixe. Wezîrê Parêziyê ya Îsraîlê dide zanîn ku hejmara van kesan tevî maliyên wan li dora 6 hezaran e. Ji wan kesan re "çivik" tê gotin.

## Li Brezîlyayê hê jî zarok tên kuştin

Du salan piştî kuştina 8 zarokan (23'yê tîrmeha 1993'yan) li ber dîwarê Dêra Rioyê, çalakdarên rastgir (nîjadperest) didin zanîn ku hê jî ew li kolanên Brezîlyayê zarokan dikujin. Tê gotin ku wan bi tenê taktîka xwe guherîne. Berê wan zarok bir bi bir di kuştin, ji ber vê yekê kirinên wan pir deng vedidan, lê niha yek bi yek tên kuştin, lewra kêm kes pê dihese. Ev du sal in 5 polîs ji ber kuştina zarokan têne darizandin. Wan polîsan du salan berê 70 zarok gulebaran kiribûn, ji wan 8 heb kuştibûn.

Li aliyê din Wezîrê Dadê yê Brezîlyayê da zanîn ku ew kuştina 154 mirovên ku ji ber xebatên xwe yên siyasî hatine windakirin, dipejirînin. 154 kes di navbera salên 1960 û 1985'an'de ji aliyê hêzên tarî yên cuntayê ve hatibûn windakirin. Wezîr got ku wan ji bo avakirina komisyoneke ku li aqûbeta van kesan bipirse, qanûnek şandine meclîsê. Malbatên kesên ku hatine windakirin, hikûmetê rexne dikin ji ber ku ew ji bo girtina kujyaran tu xebatê nake.

## Al'yê Kenya rexne kir

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (AI) hikûmeta Kenyayê ji ber binpêkirina mafên mirovan rexne kir. AI dide zanîn ku li vî welatî mafên mirovan, bi taybetî jî mafên jinan tên binpêkirin. Polîsên Kenyayê ji bo ku mirov li xwe mikur bên, îşkenceyê li wan dikin. Her wiha di bin çav de polîs tecawuzî jinan dikin. Al'yê berî civîna Bankaya Dinyayê ya ji bo alîkariya vî welatî, hefteya çûyî li Parîsê ev rapora xwe daxuyand. Rêxistinên mafên mirovan dixwazin ku alîkariya madî li gorî rewşa mafên mirovan bên dayîn, lê rayedarê Bankaya Dinyayê îdia kirin ku haya wan ji rapora Al'yê çênebûye.

# Somalî: Welatê tevlîhevî û xelayê



Şer û tevlîhevî rewşa gel xerabtir dike.

Li Somaliyê Mohamed Farah Aideed bi windakirina hinek hevalbendên xwe qels dibe. Piştî têkçûna operasyona Neteweyên Yekbûyî, li Somaliyê tu pêşketin çênebûye. Her wekî berê tevlîhevî, pevçûn û nexweşînên wekî tîfo û maleriyayê dibin sedema mirina mirovan.

Osman Atoyê ku Serokê Hevkariya Neteweyî ya Somaliyê (HNS) Aideed ji aliyê diravî ve destek dikir, roja 8'ê gulanê diyar kir ku ev demeke dirêj e dubendî ketiye navbera wî û Mohamed Farah Aideed. Osman Ato da zanîn ku ev dubendî ji sermaweza 1992'yan ve didome û li ser alîkariya derve ya ji bo gel derketiye. Tê gotin ku Aideed naxwaze hêzên derveyî bi tu awayî têkilî wan bibin. Li aliyê din li başûrê Somaliyê nîv milyon mirov ji birçî û nexweşînan dimire, Ato dixwaze ku rêxistinên alîkariyê vegerin Somaliyê. Li gorî rapora ku rêxistineke bi navê Charity International li Yemenê amade kiriye; li herêma Jubayê hejmara kesên ku ji ber nexweşiyên wekî tîfo, kolera, maleriyayê mirine, gihîştiye radeyeke bilind. Bi tenê li gundekî 20 kes ji ber xelayê, 40 kes jî ji ber tîfoyê mirine. Her wiha Aideed berpirsê karê derve yê rêxistina xwe Abdi Hassan Awale Qeydid jî ji kar avêt. Ev di şerê çekdarî yê li hemberî leşkerên Amerîkayê de serokê baskê çekdar ê HNS'ê bû. Ev her du kes heta dawiya meha gulanê jî hêj li Mogadishu di nav refên rêxistinê (HNS) de bûn. Aideed nikaribû wan bi hêsanî ji rêxistinê biavêje. Osman Ato bi hevrikê Aideed Ali Mahdi Mohammed re hevdîtinan pêk tîne. Alîguherîna wî wê hevkêşeyê serûbin bike, ji ber ku Ato erebeyên sivîl vediguherîne yên teknîk ango leşkerî

Tê gotin ku Somalî hê jî ji aştiyê gelek dûr e. Di nîveke avrêlê de UNESCO'yê li Sanaya Yemenê civînek li dar xist, lê her du hêzên sereke; Aideed û Ali Mahdi Mohammed beşdar nebûn. Beşdaran ev xwestin; divê lihevkirinek hebe ji bo ku Somalî ji nû ve ava bibe û rêveberiyeke ku karibe kar bimeşîne, çêbibe. Hemû beşdaran dipejirand ku bêyî her du rêxistinên xurt, tu gav nayên avêtin.

**Nûçeyên Derve**

# Çavdêriyên li ser riya mirinê

*Ev çend roj in li ser şerê sirbî û boşnakan pir tê nivîsîn. Rojnameyên tirk ku li dijî kurdan şûkrêşiya şerê kirêtî dikin, li Bosnayê qala mirovahî û dilovaniyê dikin. Nivîskarê kovara Newsweekê Rod Nordland li ser mirovên ku ji Srebrenikayê reviyane û xwe gihandine kampa Tuzlayê ,çavdêriyên xwe nivîsandine. Ev çavdêrî kirêtiya şerê Bosnayê li ber çavan radixe em durûtiya çapemeniya tirk deynin aliyekî, guh bidin çavdêriyên Rod Nordland ji ber ku şerê kirêt li her derê eynî ye.*



Mirov di nava listeya de li lezim û maliyên xwe digerin.

Sahaheta Baciroviç li ser riya çiyê dîtiye ku sirbiyan 500 mêr xistine ser çongan û destê wan li paş stûyê xwe girêdane. Ew kes dîlên misilman bûne, li gorî gotina wê sirbiyan zor dane wan kesan ji bo ku ew li ser çongan bimeşin. Sirban henekên xwe bi wê û jinên li nik wê kirine û gotine: "Wa ne mêrên we, wa ye artêşa we, emê wan bikujin."

Baciroviç çavên xwe bi lez li ser mirovan digerîne, bi hêviya ku çavên wê bi mêrê wê bikeve, lê wî nabîne. Ev dibêje: "Pir hindik hêviya min maye, ji ber ku demeke dirêj di ser re derbaş bû." Jinikeke din rondikan dibarîne û dibêje: "Li ser riya Srebrenikayê min bir bi bir cendekên mirovan dîtin ku qirika wan hatibû birîn." Kesên ku dijîn rêwingiya xwe wekî "meşa mirinê" bi nav dikin. Roja 11'yê tîrmehê Srebrenika ket destê sirbiyan (ev der, berê ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve wekî parêzgeh hatibû daxuyandin) piştî wê 12 – 15 hezar kesên ku bi kêrî şer dihatin, derketin çiyan, bi hêviya ku nekevin destê sirbiyan. Ji 10'an 9'ê wan kesan bêçek bûn. Piraniya wan kesan rastî bombebarana sirbiyan hatin, her wiha kesên ku dijîn dibêjin ku sirbiyan kemîn danîne ber wan, ew ji hev pelişandine. Kesên ku ji refên xwe veqetîne, bi destê sirbiyan tavilê hatine kuştin.

Hinek çavdêr dibêjin ku gelek mirovên bêçek xwestine xwe radest bikin, lê hatine kuştin. Pir kêm kesî xwe gihandiye Tuzlayê. Karkerên rêxistinên însanî û kesên ku li sûcên şer dikolin, diyar dikin ku ji 9 hezar kesî 6 hezar kesên ku ketine rê, hatine kuştin. Leşkerekî boşnak bi navê xwe Sadik Malic dibêje ku wan gelek kes şandina ser sirban, ji bo ku şert û mercên teslîmbûnê deynin, lê ew kes venegerîne. Dîsa gelek kes dibêjin ku wan sirbî li ser cemseyên zirhî yên Neteweyên Yekbûyî dîtine. Li gorî gotina wan sirbiyan ji ser cemseyên NY'ê bi hoparloran deng li wan kirine ku ji çiyê dakevin, kesên ku bi wan xapîne hatine gulebarankirin. Alija Omeroviç dide zanîn ku gelek hevalên wan bi vî awayî hatine kuştin.

Li gorî gotindaran sirbiyan guh û pozê hin boşnakan jêkirine û ew seqet hiştine. Enver Alaspahic li ser rê tê dîtin, li ser rûyê wî nîşana xaçê hatiye çêkirin. Mirso Avdic ji endamê partiyê ye ji kesê ew dîtiye dixwaze ku wî bikuje, lê ew kes vê yekê nake, wî di vî halî de dihêle. Di rê de boşnakan birînên xwe bi xwe pêçane. Vekas Cryk (23) ji aliyê çar mirovên sivîl ve bi darbesteke tê kişandin. Lê dema êrîşa topan dest pê dike, wî berdidin, diçin. Ew riya mayî peya, tevî ku guleyekî çenga wî qul kiriye, temam dike. Dîsa Vekas Cryk bi çavên xwe dibîne ku leşkerekî birîndar bi çeka xwe pêşî 4 kesên ku darbesta wî dikişînin, pişt re jî xwe dikuje.

Tê gotin ku hin sirbiyên ku karên hov dikin dûvikên Zeliko Raznatovic in. Ew kes bi navê Arkan û zilamên wî jî bi timtêlên xwe yên reş tên nasîn. Nevlida Prica ku birayê wê û mêrê wê di nav kesên windayî de ne, dibêje ku wê sirbiyên bi kincên reş dîtine. Wan kesan zarokekî 12 salî ji otobusa dîlan danîne, diya wî xwestiye xwe bide ber wî, lê sirbiyan ew zarok kuştine. Li ser vê yekê dayika wî bi xavika serê xwe, xwe bi guliyê darê ve darde kiriye.

**Nûçeyên Derve**

# FAL

**BERAN** (21 Adar - 20 Avrêl)

Ji bo ku hûn karibin di karên xwe de bi ser bikevin, we hinekî tecrûbe divê. Lewra qet lez nekin, hinekî bi aram bin. Piştî demekê ger hûn nexwazin jî wê riya serkeftinê li ber we vebe. Kî pir bi lez ket, ew li paş ket, ji bîr nekin.

**GA** (21 Avrêl - 21 Gulan)

Pêşiyên me gotine, "Ji keseran kes namire" wisa dixuye ku hûnê vê gotinê çewt derînin. Rewşa we ya aborî ne xerab e, lê çi heyf ku hê jî hûn li hemberî xweşhaliya cîranên xwe dihesûdin. Çavnebariya we, wê belayeke mezin bîne serê we.

**CÊWÎ** (22 Gulan - 21 Pûşper)

Hûn di warê bikaranîna peyv û biwêjan de pir jêhatî ne. Hin caran tevgerînên we mirovan didin kenandin. Xelk ji we re dibêje: "Li ber defa bêdeng direqise." Heke hûn bi qasî zimanê xwe, serdestî hal û hereketên xwe bin jî, wê pir baş bibe.

**KEVJAL** (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)

Her çawa ku hûn zû dilê heval û hogirên xwe dihêlin, pir bi rehetî jî dilê we bi gotineke biçûk dişikê. Ji ber vê yekê hem hûn, ji xwe hem jî derdor ji we aciz bûne. Her wekî mirovan, ji bo hin xisletan jî hin caran mirin zêrê zer e.

**ŞÊR** (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)

Hin caran bi we wisa tê ku kes hez ji we nake. Van rojan jî hûn wisa hîs dikin, lewma qet kêfa tune. We ji kul û derdan rû û simbêl berdane. Lê ev rewş zêde dewam nake, wê gula evîna jiyanê di dilê we de bibişkive.

**SIMBIL** (24 Gelawêj - 23 Rezber)

Hûn ji kesên ku bi awayê rabûn û rûniştina xwe nizanin hez nakin. Lê van rojan tiştên ku dilê we li hev dixin, hûn bi xwe dikin. Kirina gelek karî bi hev re, psîkolojiya we xerab dike. Wekî pêşiyan gotiye, "Bila hindik be, bila rindik be."

**MÊZÎN** (24 Rezber - 23 Kewçêr)

Hin caran bi rojan bêrawestîn hûn dixebitin, lê roj tê tiraliyeke ecêb siya xwe dide ser we û piştî xwarinê gotina, "Kurmanc î têr e, xew jê re xêr e" tê bîra we û hûn hew guh didin henek û qerfan. Ji jîr û tiraliya we re hevkêşeyek denge divê.

**DÛPIŞK** (24 Kewçêr - 22 Sermawez)

Xelk ji bo we dibêje, "Ken dike, fend dike." Di bin kenê we yê herî dostane de jî li planeke nebaş digerin. Bi vî awayî hûn nikarin wan bidin bawerkirin. Yek çare heye; serrastkirina îmaja xwe bi kar û xebatên ji bo başiya mirovan.

**KEVAN** (23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Hûn di rê de pirî caran li ber xwe nanêrin. Ev yek jî dibe sedem ku hûn li kevir kuçikên li kêleka rê biqelibin. Solên we ji ber vê zû diqetin. Lê dema hin kes balê dikişînin ser vê yekê, hûn dibêjin, "Malê ji malxwê dipê" û hûn pev diçin.

**KARIK** (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)

Serhişkiya we tu caran nagihîje wê radeyê ku hûn dilê mirovan bihêlin, ji ber vê yekê hin caran ev tişt li xweşiya mirovan jî diçe. Ev rastî nikare hebûna piçek çavnebariya we bide jibîrkirin. Lê dîsa jî "Negerin li newalan, nebînin xeyalan."

**DEWLIK** (21 Rêbendan - 11 Reşemî)

Tu kes newêre ji we deyn bigire, ji ber ku hûn mirovan dilewitînin. Dema naçar bimînin jî dibêjin, "Ne li newalên kûr razê, ne jî xewnên xerab bibîne." Lê pir najo, hûnê jî li destê xelkê binêrin, bila haya we jê hebe.

**MASÎ** (20 Reşemî - 20 Adar)

Bes xwe bixapînin. Ji bo dîmeneke xweş, hûn bi rojan li çol û beyaran digerin, lê ji bo aboriya xwe hûn qet li çareyekê nafikirin. Kes alîkariya we nake, herkes dibêje "Min hêka wî li diranê xwe xistiye." Heke wiha here, hûnê ji nêzda bimirin.



# Cerdevaniya Şêx

Li Dihê (Eruh) li gundê Baluka şêxek hebû. Gel, rûmeteke mezin dida vî şêxî. Civata şêx hemû deman bi berfirehî digeriya. Destê şêx, tu caran bi ava sar û germ nedibû. Lê şêx buhayê wê rûmeta ku gelê deverê didayê, nedizanî.

Bi vî awayî gelek sal û zeman çûn. Di sala 1987'an de, şêx û çend kesên li dora xwe bûn cerdevanên dewletê. Şêx jî bû sercerdevan. Piştî ku şêx bû sercerdevan, civata wî jî ji hev bela-wela bû. Êdî wekî berê rûmeta şêx di nav gel de nema û kesî silava Xwedê jî lê nedikir. Gava ku şêx di nav kolanên gund re derbas dibû, zarokên gund bi pey şêx diketin û henekên xwe bi tivinga wî dikirin. Lê ev hemû ji şêx re ne xem bûn. Ne fedî dikir, ne jî li ber xwe diket.

Rojekê êş dikeve çavên şêx û gazinan ji çavên xwe dike. Êvarekê şêx ji pîreka xwe re dibêje: "Ji kerema xwe cilên min î paqij amade bike, sibê ezê herim nexweşxaneya Sêrtê. Li bajêr herkes min nas dike, zanin ku ez sercerdevan im, ji ber vê yekê divêt cilên min paqij bin."

Şêx wê şevê tembîha gund li mirovekî xwe yî cerdevan dike, ji ber ku kesekî ew li tirimpêla xwe suwar nedikir, şêx li tirimpêla leşkeran suwar dibe û berê xwe dide bajarê Sêrtê.

Ji ber ku êşa çavê şêx giran bû, berê şêx dane bajarê Amedê, cem bijîşkê çavan. Gava ku şêx gihîşte nexweşxaneya Amedê dît ku li ber dergehê bijîşkê çavan mirov li pey hev rêz bûne. Şêx zanî ku heta bi du rojan dora wî nayê. Lê niyaza dilê şêx tunebû ku du rojan di dorê de bimîne. Di wê gavê de şêx hêrs dibe û gazî bijîşk dike û dibêje: "Ma qey hûn min nas nakin, hûn nizanin ez kî me!? Ez sercerdevanê dewletê me û hûn min dixin dorê. Ma wisa dibe?!..."

Belê gava ku şêx bi sercerdevaniyê xwe dide naskirin, bijîşkê çavan bi destê şêx digire û wî dibe hundir û li ser maseya emeliyatê wî radizîne. Bijîşk, çavê şêx yê sax derdixe û dîsa dipêçe. Ji şêx re dibêje:" Heta bi heftiyekê divêt tu çavê xwe venekî. Piştî ku heftiya te qediya, wê hingê çavê xwe veke, tu dê dinyayê baş û ronî bibînî".

Şêx bi dilxweşî berê xwe dide gund û piştî heftiyekê ji pîreka xwe re dibêje: "were çavê min veke". Gava ku pîreka şêx çavê wî vedike, tê zanîn ku çavê şêx pûç û vala ye. Digel vê yekê şêx dike hawar û dibêje: "Hebe tunebe, ew bijîşk jî hevalê teroristan e. Heger na, çima wê çavê min î saxlem derbixe!?"

Piştî vê bûyerê her çende şêx tivingê datîne jî, lêbelê dereng dimîne. Lewra, hem ji dêrê dibe, hem ji mizgeftê. Êdî, navê wî dibe "Şêx Koro"

**.XÊREDÎN MIŞAR**

# Xencera xalê Silo

Dema 12'ê îlonê ye. Leşkerên romê, ketûber li ser gundan digerin û herêmên çoltere qoleçan dikin û daxwaza çekan ji gundiyan dikin.

Rojekê leşkerên romê derdora Kurdhaciyanê digirin û bere bere bi nav gund de diçin. Gundî şerpeze dibin; dest bi veşartina tiştên xwe dikin. Xalê Silo jî, xencerek wî heye, ew jî digel biraziyê xwe ji bo veşartina xencerê li cihekî digere.

Li du-sê cihan xencera xwe vedişêre, lê dilê wî nakeve cih û her cih diguhere. Biraziyê xalê Silo, ji vê kiryara wî gelekî aciz dibe û jê re dibêje: "Xalo, ma tu çi dikî? Va ye cendirme hatin, bilezîne da em ji vir biçin".

Xalê Silo jî şepiliye, nema zane wê çi bike û ji biraziyê xwe re dibêje: "Kuro ma va ye ez dizanim ku me xencer li vir veşartiye, vêca çawa cendirme wê nizanibin!"

**BAVÊ EGÎD MAREM**



www.arsivakurd.org

## Bangawaziya A. Öcalan (2)

# Hûn jî dikarin ji xwe re riyekê bibînin!



Dibe ku hûn, ev serê heftê salan e di nav vê sosyalîzmê de bin. Lê, temet (bi qasî) ku ez dibînim, hûn gelekî li paş mane. Geşedana we ya çandeyî çiqas e? Ev jî zor lawaz e (zeîf e); kurdiyeke bêhêz û bêsiyaset. Kurdîniyeke bes çandeyî jî, kurdîniyeke mezin pêk nayîne. Hûn jî dibînin kurdîniya ku bi we re geş bûye, bi kêrî tiştekî jî nayê. Bi vê kurdîniyê, hûn nikarin xwe xudan bikin, hûn nikarin xwe biparêzin. Malê wê jî, jiyana we ya berê jî ji dest we çû. Her wisa diyar dibe ku kurdên herî bêçare, kurdên Sovyetê ne. Li hemû deverên Kurdistanê gelê kurd hatiye xistin, serhildanên wan hatine perçiqandin. Dîsa ez dibêjim, sosyalîzma reel, gelê kurd ji deftera jiyanê derxist. Hemû hêz û jêhatina xwe pêşkêşî dewletên derdora Kurdistanê kir. Di nav xwe de jî buhayê kurdan roj bi roj şikand. Bi rastî bi yekcarî buhayê kurdan nezanîn. Û di dawiyê de hûn ji gelên li derdorê xwe, ketin warekî hêj lawaztir (zeîftir).

De bila, eger û mêjûya vê çendê, ne hinde girîng e. Ya girîng, ji niha û pê de, divêt hûn çi bikin. Digel geşbûna şoreşa Kurdistanê, doza we jî geş dibe. Gelê me ji nû ve, careke dîtir xurt dibe. Bi şêweyeke şad û bextewer, li nakokiyên welêt bi xwedî derdikeve. Hûn li hev kom dibin, bi hev re digihên encamekê û hêj bêhtir hûn baweriya xwe bi PKK'ê tînin. Hûn dixwazin li ber ronahiya vê siyasetê bi pêş kevin û bilind bibin. Êdî roj bi roj ev daxwaz wê bi we re geş bibe. Ev daxwaz, ev welatperwerî wê geş dibe û wê we bi hêz bixe. Helbet, hûn hêj gelek tiştan dixwazin.

> **Her wisa diyar dibe ku kurdên herî bêçare, kurdên Sovyetê ne. Li hemû deverên Kurdistanê gelê kurd hatiye xistin, serhildanên wan hatine perçiqandin.**

Li Ermenîstanê malbatên kurdan ji hev tar û mar bûn. Ezerbêcan ji bo pêşketina we dest nade. Rûsya jî ne hinde berketiyê kurdan e. Ji bo berhevbûna we cihek jî tune ne. Deverên ku hûn bikin bajar, bikin gund jî tune ne. Gund û bajarên ku hûn lê hene jî, we ji wan derdixin. Helbet, çûna Ewrûpayê jî ne çare ye. Jixwe li Ewrûpayê bi qasî hejmara we, kurd lê hene. Ez bawer nakim ku îmkanên wan jî bi qasî îmkanên we hebin. Dibe ku hindek malbatên we herin Ewrûpayê lê ev jî ne çareserî ye. Ji ber ku hîna Kurdistan nehatiye damezrandin, ez nikarim ji we re bibêjim "Berhev bibin werin Kurdistanê." Hîna ew wext nehatiye. Ez dibêjim çare, berhevbûna we ya li Rûsyayê ye. Rûsya, welatekî berfireh e. Ez bawer nakim li dijî kurdan rabin. Divêt hûn, hinek têkiliyan bi wan re deynin. Helbet bêyî dostaniya PKK'ê jî nabe.

### Ji xwe re riyekê bibînin

Hûn dikarin li cihên wek Kazakîstan, Ozbekîstanê kom bibin û hinek gundan ji xwe re ava bikin. Heger we karîbûna li Kurdistana Sor (Laçînê) cih bigirtana, wê hîn baştir bibûya. Deh hezar, bîst hezar kes kom bibin û mîna kurdên Bakur ku li Başûr bajarek ava kirin, we jî dikarîbû bajarekî ji xwe re ava bikira. Kurdên li Sovyeta berê belav bûne, hûn dikarin ji xwe re riyekê bibînin li hev bigerin, bibin yek. Heger we ev pêk anî hûn karin ji xwe re warekî bibînin û ava bikin.

### Cihê xwe bigirin

Li bin serperiştiya (öncülük) PKK'ê êdî yekîtî hate damezirandin. Niha jî digel deh hezaran ev yekîtî tê damezirandin, divêt hûn daxwazên xwe bixin warekî siyasî, bi hindek plan û programên ku we ji xwe re amade kirine divêt hûn bimeşin. Îro ez nikarim ji we re "herin her derê" bibêjim. Merc û îmkanan binirxînin û paşê bizavê bikin. Hûn dikarin berê xwe bidin Kurdistanê jî. Bê çawa tirkên Sovyetê tên Serhedê, hûn jî bizavekê bikin û "Emê herin welatê xwe" bibêjin. Kurdên bakur çawa çûn başûrê Kurdistanê, hûn jî dest bi bizaveke wisa bikin. Divêt hûn bi bizaveke wisa rabin. Dibe ku zehmetiya wê hebe, divêt wisa be. Heger hûn bi bizaveke wisa rabin, wê hinek tişt bêne guhertin. Wê vîna we xurt bibe, wê bizava we geş bibe, wê îmkan peyda bibin. Lê divêt hûn nenivin. Kî çi bibêje, bila bibêje, hûn di ser guhên xwe re biavêjin, kîjan dewlet çi bibêje hûn guh nedinê, heger hûn bi ya wan bikin, qedera we mirin e. Di vî warî de PKK'ê ronahî pêk anî, siyaseta rast û durust li ber çavê we danî. Riya welat vebû, hêdî hêdî welat tê damezirandin. Têkiliyên xwe bi me re deynin bila haya me ji we hebe. Ezmoniyên (tecrûbeyên) PKK'ê baş binirxînin, encamekê jê derxînin û li pêş ronahiya van ezmoniyên me, hûn jî xwe bi rêk û pêk bixin û ji xwe re rêxistinekê damezirînin, vala nemînin. Hemû gavan hişyar bin, xwedan daxwaz û armanc bin.

### Eniyeke xurt pêk bînin

Heger hat û li dewletekê cih bi dest we neket, hêdî hêdî ber bi welatê xwe werin. Werin Kurdistanê, xortên we hene, keçên we hene. Gelek îmkan jî hene. Çek pir in, mamoste pir in, hemûyan bikin leşker. Bila di nav we de jî kiryarên xurt yên siyasî û leşkerî hebin. Her wisa hûn dikarin eniyeke xurt pêk bînin. Bi vê hêza xwe hûn dikarin digel me, mil bi mil di cengê de cihê xwe bigirin. Bila hemû kurdên Sovyeta berê, bi alîkariya PKK'ê li dûv siyaseta PKK'ê bimeşin. Ez bawer dikim ku tiştên heta niha rû nedane, wê rû bidin û xebata me wê bi serkeftina me encam bide.

Heta dawiyê riya welat, riya serxwebûnê û riya cengê vebûye. Ez li ser bingeha van rastiyan, bi xêr hatina we dikim. Her wisa ez silav û rêzên xwe pêşkêşî tevahiya gelê me yên ku li Sovyeta berê yên li derveyî welat û yên li nav welat dikim û daxwaza serkeftinê ji bo hemûyan dikim.

---

**Yên berî me çi, çawa dinivîsandin**

# Ji dîroka rojnamegeriya kurdî

Nivîsek ji hejmara 30. a Kovara Hawar
Mêjû: 1941, 1'ê tîrmehê

## RABÛN Û RÛNIŞTIN

Kurd gelek bi edeb û terbiye ne. Rabûn û Rûniştina wan, dan û standina wan bi rêz û tertib e. Kurd nazik, giran û bi edeb in. Xwediyê gotina xwe ne; paşgotiniya xelkê na kin; dostê dostê xwe, û dijminê neyarê xwe ne.

Pir na xêvin, gotina xwe bê sebeb dirêj na kin, gava erê dibêjin erê ye û gava no dibêjin no ye. Beriya ko tiştekî bêjin, wî tiştî xweş didin eqlê xwe û êdî ji gotina xwe bi şûn da venagerin; heke wad dan poşman na bin; bi dilxweşî û ciwamêrî wada xwe tînin cih.

Qencî û xirabiya ko ji wan re hate kirin, ji bîr na kin; heke dijminê wan kete bextê wan, di sûcê wî diborin.

Lê ez dibînim, hinên di wan, rêz û rêzikên bav û kalên xwe ji bîr kirine û bi adetên miletên biyanî ên nexweş emel dikin. Ev tiştekî ne çak e, xerab e. Divê mirov dev ji adetên bav û pêşiyên xwe ên qenc bernede.

Tenbî û qeydeyên jêrîn ji bona wan in:

Gava ji kesekî tistekî dixwazin, me bêjin –bide minlê bêjinji kerema xwe bide min.

Ko ji we re tiştek hate danspasbêjin û pê dilxweşî û minetdariya xwe bidin zanîn.

Gava kesek ji we tiştekî dixwaze û – kerem ke – dibêje, lê vegerînin û bêjindi nav keremê de bimînî.

Heke kesekî banî we kir; lebê an fermû, an ez xulam, ez benî, ez gorî, ez qurban bibêjin. Kurd hemî wisa dibêjin.

Ko kesekî ji we tiştek pirsî –erê– an –na–, yan dizanim an zinanim bêjin; hi, ha me bêjin û serê xwe mehejînin, ev kêmasiyek e.

Gava hon tiştekî tiştekî vedixwin, bi edeb û isûl vexwin; hêdî, hêdî û bêdeng bikişînin yên dora xwe aciz me kin.

Wadê hon li ser xwarinê ne û parî di devê we de ye milçe milç û çelq û çelq me kin. Heke hon di civatekê de, di nav xelkê de rûniştî ne, bi qirpe qirpa qirika xwe kari bin, hevalê dora xwe aciz me kin, nemaze ev tiştekî pir eyb e; kêmaniyeke mezin e.

Pêşbirî li jin û zarokan me kin; rê li wan me birin.

Wadê hon daxêvin, dengê xwe bilind me kin û heke mirovek dipeyive, gotina wi me birin û beriya ko ew gotina xwe biqedîne, dest bi axaftinê me kin. Her rastiyê bibêjin; derewker rûreş in.

Dest û tiliyên xwe me kin dev û difn û guhê xwe û wan pê paqij me kin.

Wadê hon dikuxin an dibihnijin, destê xwe û hêj çêtir destmala xwe bidin ber devê xwe.

Li erdê tif me kin. Goşt û xwarina ber diranan tû me kin erdê. ariya cigara xwe, di nav civatê de, me weşînin erdê.

Li zaroa me din, wan pir me êşînin; wan tirsiyandî û çavkênandî me kin, ew pê derewîn dibin.

Çiqas ji bixeyidin dijûna me kin xeberên xerab me bêjin.

Bê sebeb sond me xwin; bê îşekî giran xelkê me din ber sonda.

Di nav axaftinê de, bi serê bav û pêşiyê xwe sond me xwin û bi serê bav û kalê xelkê û gora wan jî sond me xwin; ev tiştekî zehf kirêt e.

Gava ko hon tên malekê û banî we dikin ser xwarinê, bi derew me bêjin em têr in; û werin ser sifrê.

Wadê ji we tiştek tê pirsîn; xweş bala xwe bidin heta ku hon bikarin cihabê lê vegerînin.

Gava kesek ji we re tiştekî dibêje an qise dike, bi lez û bez me bêjin ez dizanim; guhê xwe bidin ser galgala wî; bi bala fireh mirov hêj çêtir dielime.

Ern û bihintengî tiştine neqenc in; nemaze li ber mirovên qels hu belengaz û jin û zaroa: dilşekestina wan kêmasiyek e.

Çavsoriya xwe li xurtan bikin, li yên di ser xwe re bikin, ne li yên di bin xwe re ne li yên kêmî xwe.

**DR. KAMIRAN ALÎ BEDIR–XAN**

Sadrettin Aydınlık pirsên me yên li ser Kongreya 5'an, rewşa kom û rêxistinên kurd û çepên tirkan bersivandin.

# 'ŞEREFA ME ŞOREŞA ME YE'

**Hinek tiştên ku di dîrokê de bûne wekî nîşan, mîna dasok û çakûç; îro zêde feydeya wan nemaye, tu tesîra wan jî nîn e. Di cihê wan de, îro mirovahî çi dixwaze, welatê me çi dixwaze, ew girîng in. Tiştên ku zemanê wan boriye, emrê wan tije bûye divê ji holê bêne hildan. Di şûna wan de nîşanên ku îro tesîra wan li ser gelê me, li ser mirovahiyê heye, hewce ye derkevin pêş. Îro nûtî pêwist e. Li ser vê yekê ji alê, dasok û çakûç hatine derxistin.**

*Bi kesekî di pişt "heft deriyê hesin" de pêkanîna hevpeyvîneke tiştekî cihêreng e. Bi mebesta ku em awir û nêrîna wan, nirxandin û şîrovekirina wan ên li ser bûyer û mijarên siyasî hîn bibin, pişt re pêşkêşî raya giştî bikin me hevpeyvînek bil Sadrettin Aydınlık re çêkir.*

*****

**Ez dixwazim ji Kongreya 5'an dest pê bikim. Li ser vê kongreyê pir gengeşî çêdibin û wisa dixuye ku hîn jî dê xwe bi eleqedaran bide gengeşîkirin. Kongreya 5'an a PKK'ê çi ye? Ji bo paşerojê çi dide pêşiya xwe?**

– Di serî de vê bibêjim. Kongre bi rêberiya Serokê Giştî Abdullah Öcalan li dar ket û nêrînên wî yên kûr, dûr û fireh û perspektifên wî bûn şewq û şemal. Bûn roniyeke mezin li hemberî tarîtî û kêmasiyan.

Ev kongreya 5'an, bû xîmê (bingeha) meseleyên Kurdistanê yên neteweyî, civakî, siyasî, demokrasî, aştî û yên dewleteke serbixwe û azad. Ev kongre, naşibe kongreyên berê. Kongreyên berê li gorî şertên cengê û ji bo xwe îspatkirina di welat û cihanê de bûn. Ji bo xwe bi neyaran bidana qebûlkirin, bûn.

Kongreya 5'an, maka hemû kongre, konferans û xebatên berê ye. Biryara avakirina dewleteke serbixwe û azad e, serketina cengê ye, qelandina neyar û dekên wî û yên xiniz (xayîn) û xwefiroşên hundir û derve ne. Bi kurtî, kongreya 5'an ziman û kilîta damezradina Kurdistanê ye.

**Hûn der barê guhartinên ku di Kongreya 5'an de, di PKK'ê de çêbûne, wekî ji ala PKK'ê derxistina dasok û çakûç û awayê pergala rêxistinê (organîzeyê) çi dikarin bibêjin? Li ser van yekan rexne li tevgera azadiyê tê kirin ku dev ji sosyalîzmê berdaye, gelo ev rast e?**

### Kabeya PKK'ê, gelê Kurdistanê ye

– PKK, Serokê Giştî Abdullah Öcalan, ji roja ku dest bi şerê fikra serxwebûn û azadiyê û cenga çekdar kirine ta niha, tu dem bi fikrên kevin, yên lipaşmayî, yên ku dema wan borîne, yên klasîk û yên îdealist (metafîzîk) ve giredayî nemane û namînin jî.

Tevgera azadiyê, serokatiya PKK'ê tim û tim li dijî paşverûtiyê, kevneperestiyê, li dijî mêtingeriyê, li dijî sermayedarên mezin û împeryalîstan û li dijî fikrên çep ên ne rast û li dijî nêrînên hêzên rastgir (saxcî) ceng kirine, têkoşiyane. Bi vê yekê ji namînin her dem lê xebitîne ku li gorî dem xwe nû bikin û xwe bigihîjînin (bikemilînin).

PKK û Kongreya wê ya 5'an pêşveçûn û qewmînên ku li cîhanê, li Rojhilata Navîn, Tirkiyeyê dibin, serûbiniya ku hemû cihan dijî, dibînin. Wan didin pêş çavên xwe, li gorî wan di îdeolijiyê de, di bername û derstûra hundirîn de guherînan pêk tînin. Hinek tiştên ku di dîrokê de bûne wekî nîşan, mîna dasok û çakûç; îro zêde feydeya wan nemaye, tu tesîra wan jî nîn e.

Di cihê wan de, îro mirovahî çi dixwaze, welatê me çi dixwaze, ew girîng in û wan dide ber çavên xwe. Li gorî wan tiştên ku zemanê wan boriye, emrê wan tije bûye, ji holê hildide. Di şûna wan de nîşanên ku îro tesîra wan li ser gelê me, li ser mirovahiyê heye, derdixe pêş. Îro nûtî pêwist e. Li ser vê yekê ji alê, dasok û çakûç hatine derxistin.

### Sekreteriya partiyê tenê bi serê xwe teng e

Hindek komên çep ên biçûk mîna qîzên xama yên di mal de mayî li gorî xwe her carê kabeyekê didine çêkirin. Kabeya PKK'ê gelê Kurdistanê û mirovahî ye.

Li ser guherîna awayê rêxistinê ya bi pergala (sîstema) serokatiyê jî, mirov dikare çend tiştan bibêje.

Sekreteriya partiyê tenê bi serê xwe teng e. Ancax saziyeke wiha dikare bersivê bide, li gorî têkoşîneke wiha mezin. Ev jî nûtiyeke siyasî û sazûmanî ye. Nimûneke nû û ya pêşîn e. Mîna rakirina dasok û çakûç, guherîna sîstema sekreteriya partiyê bi pergala serokatiyê, hem ji bo mirovahiyê, hem ji bo grubên çep û hem jî, ji bo şexsiyetên sosyalîst nûtiyek e.

Ev yek jî vê nîşan dide; çawa ku PKK dîwarên mêtingeriyê, paşverûtiyê û împeryalîzmê hildiweşîne, wiha jî dîwarên ku di serê sosyalîstên ne durist û ne rast de hene hildiweşîne. Ev, cesareta PKK'ê û ya Serokê Giştî, nêrîna wî ya zanîstî dide xuyakirin.

**Gelo ji ber çi sedeman, lihevrûniştinên ji bo avakirina eniya neteweyî yên di navabera hêzên kurdan de bi ser neketin û neçûn serî?**

– Mîna ku hûn jî dizanin em di girtîgehê de ne. Ez gelek dûrî wê xebatê me. Bi qederî ku tiştên di rojname û kovaran de derketine û tiştên min bihîstine, sedemên bipêşveneçûn û avanekirina eniyeke neteweyî, ji bilî ERNK'ê grubên kurd ên din in. Evî komên biçûk ku çend deştekdanên wan ên di hundirê welêt de hene, di şerê serxwebûn û azadiyê de tu giranî û sivikahiya wan nîn e. Mirovên wan hemû li derveyî welêt û Ewrûpayê ne. Navên wan hene, lê pêkanîn û emelên wan nîn in.

### PKK fersendek e ji bo pêkanîna yekîtiyê

PKK, dayîna wê ya şerê neteweyî, cih ji hemû kom û kesên kurd re çêkiriye. PKK dibêje bi dostî, bi biratî û aştî kî çi ji destê wî tê bila bike. Amade ye ku bi wan re di her warî de yekîtiyê, dostaniyê pêk bîne. Bi şertekî ku ew di xizmeta welêt de bin.

PKK keys û persendeke dîrokî ye, ji bo neteweya kurd û serxwebûna wê. Her wisa fersend e ji bo pêkanîna yekîtiyê di navbera partî, rêxistin û komên her çar parçeyên welêt de.

**Di vê qonaxê de, hûn rewşa grubên siyasî yên kurd di her çar parçeyan de çawa dibînin û dinirxînin?**

– Di serî de ez vê bibêjim, ji bilî PKK'ê di her çar parçeyan de jî tu kes bi rastî ji dilûcan şerê serxwebûn û azadiya neteweyî, civakî û çînîtiyê nade. Di teoriyê de hemû kom "xweşgo" û "xweşpeyv" in lê kir û pêkanînên wan ne zêde feydeyê dide gelê me û ne jî tehdeyekê didin neyar. Hemû ne wekhev bin jî, kêm zêde dişibin hev.

Meseleya van grûban; nebûna siyaset, bername, xeta serxwebûn û azadiyê ye. Gelek ji wan an bi vê dewletê ve an jî bi wê dewletê ve girêdahî ne. Heta bi dijmin ve girêdahî ne.

Mîna şerê di navbera PDK'ê û YNK' ê de. Bi rastî ev ne şerê di navbera kurdan de ye. Şerê berjewendiya (menfeeta) mêtingerên Tirkiye, Amerîka, dewletên ewrûpî û her wekî din e.

Do, Qasimlo jî wilo bû. Hêza mezin, bîr û baweriya mezin, xwe–hêzî, xwe–ewletî bi xwe ye. Şerê ku PKK li bakurê Kurdistanê dide jî, nîşan û nimûneya vê yekê ye. Bi vî awayî, hîmê yekîtî, dostî û biratiyê di nava parçeyên Kurdistanê û komên wê yên siyasî de tê avêtin.

Şerê birakujiyê û ne–yekîtiyê di nava

## Dewleta li ser berfê, to girt

Yazdeh sal e ku di zîndanê de ye. Di vê demê de, li gelek girtîgehan tê gerandin. Surgûnî di henga "wî" ya girtîtiyê de jî jê naqere; Amed, Aydın, Bursa, Çanakkale, pişt re jî, ji bo "tedawiyê" Stenbol Sağmalcılar.

Bi birîndarî dikeve destê hêzên dewletê. Me li jorê behsa tedawiyê kir. Li ser vê yekê der barê rewşa xwe ya tenduristiyê de van saloxan dide me: "Neyar çavêkî min di işkenceyê de kor kir. Lingekî min jî di şer de seqet bû. Vê gavê jî dilê min diêşe. Nêzîkî salekê ye ku ez hemen hemen di nava nivînê de me. Heta niha min çend car krîza dil derbas kir."

Heke hûn rewşa wî ya dadgeh (mehkeme) û cezayê meraq bikin, em vê bersiva wî bidine we. Dema ku pirsa me jî bersivand ji kenê xwe nema. "Gava şoreş here serî wê çaxê emê jî derkevin."

Gava me jê xwest bîranîneke xwe ya ku ji bîr nake, bibêje dîsa bi ken, ev serpêhatiya xwe vegote me: "Dema em derbasî welêt bûn, sal 1984 bû, gel ji me dipirsî, digotin, "Hûn bi ku ve diçin." Hevalê Sebrî digote wan:

–Emê herin dewleta xwe çêkin.

Zivistan bû, berfeke pir li erdê bû. Gel digot, 'Heyran, qurban hûn dîn bûne, we riya xwe şaş kiriye? Ma zivistanê dewlet tê çêkirin. Ku bibe bihar û berf bihele wê hilweşe." Ew jî dikeniyan, em jî dikeniyan. Bila êdî gelê me bêguman be. Bi rastî jî dewleta me li ber avakirinê ye.

Wê gavê jî hîmê wê ne li ser berfê bû. Îro jî hîmê wê li ser stûnên çiyayê Cûdî, Nûrhaq, Agirî, Sîpan, Mereto (Ebexê), Bîngol, Zagros,



Gebar, Kato, Munzûr û her wekî din in. Şoreş li ser wan e. Bila dilê gel rihet be."

grubên siyasî de kêmaniya me hemûyan e.

**Ji derdorên çepên tirkan hin rexne li PKK'ê tên kirin ku ew der barê çareya siyasî ya gelşa kurdî de ber bi reformîzmê ve diçe. Bangên şer-rawestinê ji sala 1993'yan bi vir ve ji vê rewşê re nolî nimûne nîşan didin. Heta dibêjin ku gel pasîv kirine û bûne sebeb ku serhildan jî çênebin.**

– Ev nêrîn û ev rexne ne rast in û ne di cih de ne. Ez van wekî nezaniya wan a siyasî û korbûna wan a di warê siyasî de dibînim. Neyar 3 hezar gund şewitandine, vala kirine. Bi dehan jî bajar hilweşandine. Nêzîkî 5 milyon mirovên me ji welêt derxistine. Hovîtî û qetilxwînên ku têne kirin, divê bêne dîtin.



Sadrettin Aydınlık (ê navîn) bi hevalên xwe re.

### Cenga siyasî û leşkerî wekî mêjî û hestî ye

PKK ji aliyekê ve giraniya xwe daye şerê çekdar, ji aliyê dinê ve jî têkoşîna siyasî û cihên ku lê fersendê dibîne serhildanên mezin û biçûk, çi li Kurdistanê û çi jî li metropolan, tîne pê.

Jixwe şerê çekdar ji bo pêşîvekirina siyasetê û avakirina wê ye. Cenga siyasî û leşkerî, wekî mêjî û hestî li di nava hev de ne. Ez bawer dikim ku gelek grûbên siyasî û kes an vê yekê nabînin an nizanin an jî li hesabên wan nayê loma.

**Hemin gotin hate ser çepên tirkan, em vê jî ji we bipirsin. Do û îro, di nêzîk têdan û lênihêrtinên çepên tirkan de ên der barê gelşa kurdî de çi guherîne?**

– Heke em bi kurtî pirsa we bibersivînin, îro ji çepên tirkan yek jî mîna berê ne li PKK'ê û ne jî li şerê Kurdistanê dinihêre. Tevan jî, di vî warî de gav avêtine. Hinan jî gavên biçûk.

Ev guherîna wan a siyasî, ne ji bo giştan, lê ya hinekan bi zorê ye. Ne ji dilûcan e. Gelek ji wan ne ku rast û dirust bûn, nêrîna xwe guhartin. Şerê Kurdistanê li serê wan xist. Çawa ku tevgera azadiyê xwe bi cîhanê û neyar da qebûlkirin, her wisa xwe bi wan jî da qebûlkirin.

Heke ew buhahiya PKK'ê bizanibin, tiştê ku PKK'ê ji wan re, ji şoreşa demokratîk a Tirkiyeyê re kiriye û ku hîna jî tê kirin, dê û bavên wan jî ji wan re nekirine.

**Gava ku mirov li rêxistin û partiyên çepên tirkan dinerê tê de gelek kurd hene. Fikra we ya li ser wan kurdan çi ye?**

– Bi rastî jî roja ku ez bûme welatparêz û şoreşger ta niha min tu car bi çavekî baş li wan kurdên ku di nava çepên tirkan de cihên xwe girtine, nenihêrtiye. Min her tim rexne li wan girtiye. Ez ji wan re dibêjim "Kurdên xwe windakirî", "Kurdên windabûyî"

Ew xwe nas nakin, dîroka xwe nas nakin. Gelê xwe û welatê xwe nas nakin. Parastin û menfeeta gelê xwe nas nakin. Nizanin kî ne, çi ne, serê wan li ser kîjan balgiyê ye. Ku mirov dê û bavê xwe nas neke, welatê xwe û doza gelê xwe jî nas nake. Ji ziyanê pê ve tu tişt negihandine gelê Kurdistanê.

Di nava çepên tirkan de jî stûxwar in, bêper û bask in. Bi kurtî, ew di nava çepên tirkan de mîna hûrikê kemalîzmê ne. Di nava çavên xwe de strî ne. Ew di çavên xwe de diçin.

**Di nava PKK'ê de jî kesên ku ne kurd in hene. Ji roja destpêkê ta niha ev rewş heye. Tirk jî di nava refên PKK'ê de ne hindik in. Hûn vê rewşê çawa rave (îzeh) dikin?**

– Gelê kurd û Kurdistanê, di bin zilm û zordariya çar mêtingeran de ye. Zimanê wî, dîroka wî, çanda wî, wêjeya wî, hunera wî, hemû hêjahiyên wî hatine talankirin, hatine wêrankirin û hatine qedexekirin. Rêxistinên wî yên siyasî di bin hemû cureyên pêkutî û zorê de hatine hiştin. Bêhn li wan hatine çikandin. Bi zilm û zora leşkerî dixwazin wan ji holê bidine rakirin. Ji ber van yekan gelek xwendevanên tirk, keç û xortên wan, demokratên wan ên dilsoz mîna rêberên mezin Hakî Karer û Kemal Pîr, di destpêka şoreşa Kurdistanê de cihên xwe standine. Azadî û serketina gelê xwe û ya gelê kurd di şoreşa Kurdistanê de didîtin û dibînin. Îro dîrokê ev rastî destnîşan kiriye.

### Ew bi heqîqeta xwe di nava PKK'ê de ne

Ji ber vê qasê, cihgirtina wan a di nava şoreşa Kurdistanê de ne bi awayê ku divê eslê xwe, doza welatê xwe ji bîr bikin û red bikin. Berevajiyê wê, xwe û welatê xwe baş nas dikin. Azadiya xwe û ya gelê xwe di nava şoreşa Kurdistanê de dibînin. Loma cihê xwe distînin. Divê mirov ka û genim tevî hev neke. Cihgirtina wan bi awayekî înternasyonalîstî ye.

**Hûn rewşa çîna karker a Tirkiyeyê çawa dibinin û dinirxînin. Ji hêla din ve jî hûn rewşa partiyên çep dikarin şîrove bikin?**

– Bi bîr û baweriya min, îro li Tirkiyeyê çîna karker bêrêber e. Komên ku xwe bi wesfê partiya çîna karker jî didine nasîn burjuvaziyên biçûk in. Navê karkeran li xwe dikin, navê sosyalîstan li xwe dikin, lê nav û kirinên wan qet li hev nakin. Xwezî bi navê wan, lê ne bi dîtina wan.

Sermayedarên tirk tu paxav bi wan nakin. Heke neyarê çîna karker bi wan komên ku li ser navê çîna karker tevdigerin paxav neke, divê mirov bi guman li vê rewşê binêre. Ev kom û rêxistin gotingir in, lê emel biçûk in.

Bi rastî jî îro zilm û zordariyeke mezin li ser gelê tirk û çîna wê ya karker heye. Bêhntengiyeke mezin jî di nava wan de heye. Şoreşa gelê kurd tesîrê li wan dike û lebatek jî heye. Ji bo lebatên mezin hîn pêdivî heye. Li gorî berê, dikare bê gotin ku mercên (şertên) dostaniyê di navbera me û wan de hene.

Mirov li virê dikare gotineke peşiyên kurdan bibêje: "Ez nagirîm ku dewê min tirş e, ez digirîm ku nanê min nîn e."

**Piştî vê nirxandine, îcar ez dixwazim bêm ser rewşa Tirkiyeyê, bi taybetî ya serwerên wê. Li gorî we li Tirkiyeyê pergal bi ku ve diçe?**

– Îro li Tirkiyeyê, rewşa cenga taybet heye. Di her warî de ev wisan e. Li hemberî şoreşa Kurdistanê sîstema cenga taybet bin avêtiye. Binê xwe daye bayê. Sîstem najî û nameşe. Kaş û berkaş dibe.

Bi hovîtiyeke mezin dixwaze şoreşa Kurdistanê û (ya neteweyî) û şoreşa demokrasiyê ya li Tirkiyeyê tepeser bike, tune bike. Ev jî heye, mîna berê şertê vê yekê jî nîn in. Şoreşa Kurdistanê bi her awayî ve li ser lingan e û xurttir dibe. Fikra demokrasî û aştiyê di nava tirkan de jî xurttir dibe, her çendî ji hev bela wela be jî.

Sîstem, di warê dîplomasiyê de jî paşveçûneke mezin dijî û rûçikê wê yên gemarî xwe dide der. Çar hawîrdorên cenga taybet hatine girtin. Rê û dirb jê re nemane. Di dawiyê de eger reforman neke, bi rêberê gelê kurd re rûnenê, wê mîna dûvpişk bi xwe vede û ji holê rabe.

**Li gorî demên berê awira Amerîka û Ewrûpayê ya li gelşa kurdî di çi rewşê de ye? Siyaseta wan çi ye, PKK wan di têkoşîna xwe de di ku de bi cih dike?**

– Salek berê, du sal berê Amerîka û Ewrûpayê digotin, "PKK çawa derketiye ser rûyê erdê divê wisa jî bikeve binê erdê." Ji bo vê jî, bi her awayî alîkariyên mezin didan cenga taybet a tirkan. NATO, berê digot ji PKK'ê re "erê" lê, ji Apo re "na". Ji lew re wan mezinatiya serokatiya PKK'ê didît. Li Kurdistanê, Tirkiyeyê û li Rojhilata Navîn nemana siyaseta xwe didîtin û dibînin.

### Şoreşa Kurdistanê nekse li wan dide

PKK, bi sebr, bi siyaset û bi têkoşîna berxwedaneke mezin çembera ku li dora Kurdistanê hatibû danîn, roj bi roj vekir; hûr hûrî kir. Kurdistan, doza wê ya mafdar (heqdar) bi mirovahiye, bi cîhanê da naskirin. Xwe bi dost û neyarên xwe jî da qebûlkirin.

Ji aliyê din ve Amerîkayê jî, Ewrûpayê jî dîtin ku hem li Kurdistan û Tirkiyeyê û hem jî li Rojhilata Navîn di warên leşkerî, siyasî û aborî de gelek tişt winda kirin. Nekse (derbe) li wan dikeve. Êdî kes PKK û Kurdistanê ji bîr nake.

PKK û şerê Kurdistanê ji wan re kelemekî mezin e. Ji ber vê, ji aliyekî ve jarbûna PKK'ê dixwazin û ji aliyê din ve jî dixwazin PKK'ê bînin ser riya xwe. Ji bo ku li gorî xwe ji gelşa Kurdistanê re çareyeke siyasî bibînin. Lê hîn jî bi awayekî xurt, ne Amerîka û ne jî Ewrûpa lingên xwe nedane erdê. Negotine bila ev şerê ne-mirovahî raweste.

**Îcar min divê ez li ser zîndanan bisekinim. Ji bo we zindan çi ye, çi îfade dike?**

–Daxwaza neyar ji zîndanê tunekirina mirovekî siyasî, tunekirina bîr û baweriyên wî ye. Dane tohbekirina wî kesî ye. Xwestina kirina "evdekî baş" ji bo sîstemê ye. Armanca girtiyên PKK'yî jî li dijî vê pêkutî û pesta neyar, berxwedan e, parastina bîr û baweriyan e, bihevgirtin e. Xwe windanekirin e. Bi mirin û mayîn, girêdana bi rêberiya PKK'ê ve ye.

Bi dehan şehîdên zîndanê hene. Ew ji me tevan re rêber in. Em dixwazin bi nasnameya xwe ya siyasî jiyana xwe ya li zîndanê dewam bikin. Dijmin jî dixwaze me bêrûmet bike. Em jî dixwazin heta dawiyê xwe biparêzin û bi şoreşê re bin. Mirina mezin bêrûmetî ye. Şoreşgerên zîndanê tu carî vê qebûl nakin. Divê mirov bi şeref bijî, şerefa me şoreşa me ye.

**HEVPEYVÎN: ZANA FARQÎNÎ**

www.arsivakurdi.org

## Bi êrîşên ku gerîla li Dêrsim, Culemerg, Hatay, Mêrdîn û Çewlikê di hefteyekê de kirine;

# Gelek tîmên taybet û cerdevan hatin kuştin

**Li dûv ragihadina Ajansa Kurd-A'yê û li dûv çavkaniyên binecihî, şer û lêkdadanên heftane ku di navbera hêzên dewletê û yên ARGK'ê de, rûdane, ev rapor hatiye amadekirin.**

**15.07.1995**

Li devera Qereqoçanê li derdorê sengerê (qereqola) Xelyanê, ji aliyê hêzên ARGK'ê ve buseyek (kemîn) tê danandin. Leşkerên ku dixwazin derkevin operesyonê di bin agirbarana gerîlayan de dimînin. Gerîla bêziyan ji cihê bûyerê vekişîn, der barê ziyanên leşkeran de agahî bi dest nekin.

Li çiyayê Heftanînê gerîla êrîşî ser çeperên leşkeran dikin û çeper yek bi yek ji wan têne standin û konên leşkeran hemû têne sotandin. Her wisa hêzên dewletê çeperên xwe berdidin, 11 terman bi dûv xwe dihêlin û ji gorepana şer direvin. Di vî şerî de gerîlayek jî tê kuştin.

**16.07.1995**

Li devera Mêrdînê li nêzîkî gundê Kunifir, di encama şerekî dijwar de, 4 leşker 2 cerdevan û gerîlayek dimirin.

Li navçeya Hasa ku bi ser Hatayê ve ye, komeka cerdevanan tûşî kemînên gerîlayan debin, li dûv ragihandina çavkaniyên binecih, di vî şerî de 2 cerdevan têne kuştin.

Hêzên ARGK'ê li girkê Ziyaretê ku bi ser Sasonê ve ye êrîşî ser hêzên dewletê kirin. Di encama vî şerî de, ziyanên mezin ji kuştî û birîndaran gehîştîne hêzên dewletê. Di vî şerî de dewletê ziyana xwe leşkerek dabû xuyakirin.

Her di vê rojê de, li devera Motkê, di encama şerekî dijwar de 6 leşker dimirin û hêzên gerîla bê ziyan devera şer bi cih dihêlin.

**17.07.1995**

Encama çalakiyên li hemû deveran

1-Têkçûna panzerekê bi moşekên (roketên) gerîla li ser riya Çildêranê

2-Li ser riya Rubarok û Museka, digel teqîna mayînekê têkçûna cemseyekê digel leşkerên tê de.

3-Li gundê Wadekan, di encama hêrîşeke gerîlayan de ziyanên mezin bi hêzên dewletê û cerdevanan dikevin. Ji van çalakiyan hêzên gerîla bê ziyan derdikevin.

Li ser riya Motkê Tapê hêzeke dawletê ku jî leşkeran û cerdevanan pêkhatibû, bi ser çeperekî gerîlayan de heldimevin û di encama şerekî kurt de, 2 leşker û 3 cerdevan tên kuştin.

Di encama şerê Bagokê (14.07.1995) de hate zanîn ku 4 gerîlayan û 18 leşker mirine.

Hêzeke dewletê bi alîkariya MHP'yiyan ve, li devera Yolaçti ya bi ser Kilîsê ve bi hêzeke ARGK'ê re şer dikin. Di destpêka şer de 1 militanê MHP'ê tê kuştin.

Hate zanîn ku ev şer, bi sernigûniyeke (têkçûnek) mezin ya hêzên dewletê encam daye.

Li Başûr, nêzîkî Xapûşkê di encama şerekî tund û dirêj de di nav hêzên ARGK'ê û yên dewletê de 2 gerîla û 3 leşker dimirin û 2 leşker jî birîndar dibin.

Di encama gulebarankirina trumpêleke Mît'a dewletê li derdora Hewlêrê ji aliyê gel ve 1 birîndar û 2 kes jî tên kuştin.

Digel êrîşên gerîlayan peyapey, hêzên dewletê naçar dibin û tabûra Dşariş'ê ku li devera Batane ye bi tevayî vala dikin.

**18.07. 1995**

Di encama agirbarana gerîlayan de, trumpêleke cerdevanan digel 6 kesên tê de, li ser riya Motkê-Xeman înfilaqkir.

Dîsa li vê deverê, encama şerekî dîtir. Ji aliyê çavkaniyê xwecihî ve hate ragihandin ku termên 10 leşkeran 19.07.1995 anîne navenda Motkê.

Piştî ku riya Kozluk-Êlehê dikeve bin kontrola gerîlayan û ji aliyê wan ve kontrola nasnameyan tê kirin hêzên dewletê têne deverê û di encama agirbarana gerîlayan û teqîna mayînekê di nav leşkeran de, digel têkçûna panzerekê, ziyanên mezin bihêzên dewletê dikevin.

Li devera Omeriyan hêzên dewletê gava ku li nêzîkî gundê Haciyan kemînekê datînin, hêzên ARGK'ê wan dibînin û êrîşî ser leşkeran dikin. Di vê êrîşê de ziyanên mezin bi hêzên dewletê dikevin.

Li devera Sêrtê hêzên dewletê êrîşî ser binecihekê gerîlayan dikin û diencama vî şerî de gerîlayek û 2 cerdevan têne kuştin.

Piştî êrîşên gerîlayan (13.07.1995) li ser tabûra Dûmê, navên hindek leşkerên ku di vî şerî de hatine kuştin, bidest me ketine:

Mustafa Tümen (teğmen), İsmail Toka (uzman çavuş), Güldeniz Erdoğmuş (komando), Hüseyin Demir (komando), Beyhan Demir (komando), Receb Çelik (komando), Kemal Coşkun (komando), İsmail Efe (komando), Mustafa Güngör (komando), Mehmet Çerçil (komando), Serkan Serdar (komando), İlker Sabancılar (komando).

**19.07.1995**

Li devera Dêrsim-Pilmûr'ê hindek leşker dikevin kemîna gerîlayan, 3 leşker birîndar dibin û leşkerek jî dimre.

**20..7.1995**

Wekî encama agirbarana bi moşek û doçkan ji aliyê gerîlayan ve, helîkoptereke ku ji bo leşkerên li çiyayên Kemberê (Şerwan) erzaq dibir, li asmana înfillaq kir.

**21.07.1995**

Di encama şerê li navbera gerîlayan û cerdevanan de ku li nêzîkî gundê Biryanê (Şirnak) rû dabû cerdevanek tê kuştin û 3 jî bi saxî dikevin destê gerîlayan.

Encama teqîna mayînekê li devera Xîzanê, piyê leşkerekî bi navê Halil Bilgiç jê dibe.

Di rûdana şerê Mezgirê de hate zanîn ku 16 leşker û 2 gerila dimirin. Ji hejî gotinê ye ku çapemeniya dewletê, di vî şerî de ziyana gerila 13 kuştî dabû xuyakirin.

Hêzên gerîlayan li devera Xolxolê êrîşê ser çeperên leşkeran dikin. Di encama şerekî kurt de, hêzên dewletê digel gelek birîndaran 3 termên xwe radikin û bi paş de direvin. Hindek keleperên leşkeran ji aliyê gerîlayan ve têne desteserkirin.

Hêzên ARGK'ê bi çekên giran di navenda Başkaleyê de êrîşî ser tabûrê dikin û avahiya tabûrê bi dirêjiya seetekê agirbaran dikin. Piştî belavkirina belavokan di nav bajêr de, hêzên gerîlayan bêziyan ji bajêr dûr dikevin.

Di encama êrîşa gerîlayan di navenda Hozat'ê de, avahiya emniyetê hate lêdan, 2 polîsên bi navên Recep, Bülent ku ji Eskişehîrê û ji Bursayê bûn û bekçiyek bi navê Halis Akdemir ku ji Xozatê ye dimirin û bi dirêjîya şerê şevekê bi alaya Xozatê re 6 leşker dimirin. Hêzên ARGK'ê bêziyan ji deverê bi dûr dikevin.

**22.07.1995**

Li nêzîkî Qeres'ê ku bi ser Amedê ve ye, 3 cemseyên leşkerî dikevin buseya gerîlayan û di encama agirbaraneke bi çekên giran de ji aliyê gerîlayan ve cemseyek înfilaq dibe û her duyên din jî bêser û ber dibin. Lê, hejmara kuştî û birîndarên dewletê nehate zanîn.

Di encama şerekî dûr û dirêj di navbera hêzên ARGK'ê û yên dewletê de, li nav daristanên Hiran'ê ku nêzîkî Mezgirt (Dêrsim) ê ye, li dûv ragihandina radyoyên lokalê, 2 leşker mirine û 5 jî birîndar bûne. Lê çavkaniyên gerîlayan danexuyakirin ku ziyanên dewletê zêdetirin.

Çalakiyên gerîlayan yên li deverên cur bi cur jî bi vî rengî ne. Di encama êrîşekê de li ser gundê cerdevanan Çirixê ku bi ser Kanîreşê ve ye, 2 cerdevan dimirin û 1 jî birîndar dibe. Cerdevanên ku ji derdorê tên hewarê, ji du aliyan ve bi ber agirbarana gerîlayan dikevin û li vir jî 2 cerdevan dimirin. Di encama vî şerê ku bi dirêjîya şevekê didome de, gerîlayek bi navê Medya tê kuştin.

Hêzên gerîla, li ser riya Gixê Qereqoçanê trumpeleka PTT'ê radiwestînin û digel tişt û miştên têde dişewitînin.

**23.07.1995**

Hêzên ARGK'ê danê êvarî ji du layan ve dikevin navenda Nazimiyê û digel hêzên dewletê bi şer diçin. Vî şerê ku heta seet 5 sibê vekêşa, bi mirina 4 leşkeran encam da.



Di encama şerê li Keryaderê (çiyayê Cûdî) de, hate zanîn ku 5 leşker mirine. Her wisa ji layê çavkaniyên gerîlayan ve hate ragihandin ku di navbera wan û hêzên dewletê de li deverên Heftenînê, Şîvê û Geliyê Jiyanê şerên dijwar rû dane û di van şeran de ziyanên mezin bi hêzên dewletê ketine.

Li devera Çiravê hêzên gerîla êrîşî ser tabûra Erişê kirin û hate zanîn ku di vê êrîşê de 4 leşker mirine.

Di encama êrîşa gerîlayan de li devera Kanizozanê (Şêrwan), ji hêzên dewletê 2 kes dimirin û 3 kes jî birîndar dibin.

Li dûv ragihandina Kurd-A'yê, bi rojan e ku devera Arê û çiyayê Govendê (li başûr) ji layê hêzên asmanî yên dewletê ve têne bombe- barankirin.

Ji aliyê gerîlayan ve êrîşek arasteyî tabûra Kiryareş li quntara çiyayê Cûdî hate sazkirin. Li dûv ragihandina çavkaniyên binecihê, ev êrîşa gerîlayan bi kuştina 4 leşkeran encam daye.

Li dûv ragihandina çavkaniyên gerîlayan, di encama buseyekê de ku li derdorê Şîvê û Reşînê hatibû danandin, gelek kuştî û birîndar hene.

Ji aliyekî din ve hêzeke dawletê ku li nêzîkî gundê Mamiran (Dihê) derketibûn operesyonan, ji aliyê hêzên gerok yên ARGK'ê ve buseyek li pêşiya wan tê danandin û di encama şerekî dijwar de 5 leşker dimirin.

Hêzên gerîlayan li devera Xolxolê (Çewlik) ji du milan ve êrîşî ser sengerekî leşkeran dikin û di encama şerekî tund de 4 leşker têne kuştin û hêzên gerîlayan bêziyan ji deverê bi dûr dikevin.

**2471995**

Danê êvarî gerîla riya Stilîlê û Nisêbînê (Mêrdîn) dixin bin kontrola xwe û propagandayê dikin. Di vê navbêhnê de bi hatina zeripoşeke leşkerî şer derdikeve û di encama vî şerî de 2 leşker têne kuştin.

**Kurd-A/ Welatê Me**



Wênêyek ji Yezdanên li çiyayê Nemrûd.

"Em babetem pêşkêşe bo jine têkoşer û azay kurd Leyla Zana"

# Çend serincêk le ser zimananî Xûrî û Urartî

Xûrî yan benêwebangtirîn grupî zimanewanî û kulturî serbexoy welatî kurdewarî bûn ke legel dahatinî nûsînda nêwyan hebûwe, çunke rolêkî serekiyan le mêjuy bakûrî mezopotamyada gêrawe be taybetî le layen ramyarîwe be peydabûnî paşayetî Urkîş (2230–2116 p.z) weya paşayetî Urîkîş û newar (2111–2003 p.z) herwa dewryan le layen şaristaniyeît we hebûwe, le bawarî ayîn û yasaw karîgerî zimanêwe ke beîgey ew babetaney jorîş lç nawçey nûzî (Leylan û Erapxe (Kerkûk) û "Suşare" Şimşare (deştî Bitön) dozrawetewe cige lemeş Xûriyan dewrêkî diyarî kirawyan hebûwe. Le guastnewey zor layenî kultûrî mezopotamya bo Asyay biçûk û jorî Suriya û Lubnan be taybet le çerxî tûjandnewey paşayetî Hîtîtda.

Lew nûsrawaney ke be zimanî Xûrî nûsrawîn û be parêzrawî be cê mawin nûsrawêkî paşay Xûrî–Tîşetel e ke le dewrûberî (2045–2037 p.z) jiyawe û nawî piyawî neyneway le xoy nawe.

Afsaney Xûrî (paşayetî le asmanda) ke be zimanî Xûrî nûsrawe, zoranbazêy nêwan xudawendî Xûrî–Alalu (ke le Akedîda buwe be– îl) legel xudawendî Anoy–Somerî û çend xudawendêkî dî dexate rû, herwa afsaney gilgamîşî somerî be zimanî xûrîş nûsrawetewe û le hetusas (Boxaz koy) dozrawetewe, cige lemanaş afsaneyekî zorî Xûrî kewtote nêw hîtiyan, ke be rêgey palewanan û xudawendan û nêwî kesêwe diyare Xûrîn û zorcar em efsanane be herdû zimanî Xûrî û Hîtî nûsrawnetewe û lewane çîrokî rawçî–keşî.

Lêkolînewekanî "nö" eweyan pêşandawe, kewa nûsînî Urartî le nûsînî Xûriyane we pereysenduwe, ba weku nûsrawanî Urartî kewtîbûne jêr karîgerî nûsînî aşûrida.

Urartiyan le nîwey yekemî hezarey yekî p.z be hêzêkî ramyarî zor behêz le bakûrî mezopotamyada dejmêrdran û xudawendî mezinyan (Xaldî) le Musasîr (Mîçîsîrî emro) le nêzîk Rewandiz bûwe û deslatdarêtîşan geyiştibûwe lay kêwekanî kaf

Kefkaznas û ermenînasan deyan sale hewlyandawe bendîwarêk le nêwan zimananî Kefkazî û ermenî legel zimanî Xûrî û ûrartîda peyda biken, ewîş behoy hebûnî çend wuşeyekî hawbeş, weya lêk nêzîk le nêw em zimanan û zimananî Xûrî û Ûrartîda heye, lew wuşaney, ke le zimanî ermenîda hêndrawnetewe be wêne be lêkçûwî:

Zimanê Urartiye:

Ûrartî–Sure (çek), ermenî – sur (şûr)

Ûrartî–Sarı (bax), ermanî– çar (dar û drext)

Ûrartî–Ewrî (paşa, serok), ermanî

Awrî–ord (piyawî bê jin).

Ca bew pêwaneyey ewan eger kurdêk berawirdêk lenêwan zimananî Xûrî û Ûrartî legel zimanî kurdîda bikat her lew wuşaney ewanda, ewa lêkçûnek lenêwan wuşey lêkdrawî şer û şûr (şor) legel (şari) y ûrartî û çir wek daristanî çir legel (şari) y ûrartiday bo derdekewêt û kariş her leser zimanî ûrartî nawestêt, belkû lewîş kontir, le zimanî Xûrîda wûşey (mann) î Xûrî her heman watay (man) î kurdî hebûwe, wuşey (astî) Xûrî, ke manay (jin) î bexşîwe, emro le (Estî–Stî), ke nêwî taybetî jinane mawetewew htd... Hebûnî em wuşe lêkçûwane nabêt waman lê bikat, zimanî kurdi berînewe ser zimanî Xûrî û Ûrartî; çunke zimanî kurdî le rûwî binaxey lêksîkolojî û darîştinî rêzimanêwey zimanêke ser be komeley zimananî bakûrî rojaway zimananî êranî ke ewîş gropêke le xêzanî zimananî hîndu–ewrupî.

Hendêk le zimanevananî hewliyan dawe bendîwarî le nêwan zimananî kefkazî wek naxî (çeçan, engûş û bacî) weya zimananî lezgînî (lezgîn, agul, budûx, rutûl û çaxûr) û be taybetî le nêwan ax û daxistan da peyda biken.

Lemanewe ewe rûndebêtewe, kewa deyan sale qutabxaneyek serîheldawe bo ewey zimanani corawcorî kefkazî berêtewe ser zimananî Xûrî û Ûrartî, ewey lenêw zorbey lêkolînewekanî em qutabxaneyeda serincrakêşa ewey kewa bîrûbawerêkî yekgirtû niye lemêr gerandnewey çi zimanekî kefkazî bo ser zimanî Xûrî û urartî hoy em ciyawaziyeş bo melbendî niştecêy bincî Xûriyan degerêtewe ke kafkaz nebûwe, belkû çiyakanî Kurdisatan bûwe, ew çiyayaney ke le serdemî madewe be çiyakanî Zagroz (s) nêwdarbûwe, Spayzer rastî bo çûwe, ke em zimaney be zimanêkî Zagroz (s) î le qelemdawe nek be kefkazî.


**Jêder**

1– Groz K. The Archive Wullu Family. Copenhagen, 1988

2– Filhelim G. Drêvnî Narod Hurîtî. Moskova 1992

3– D. Cemal Raşîd Ahmet, Dîrasat Kurdiye fî bilad Subartu Baxdad, 1986

4– Melikishvili G. A. Nairi–Uratu Tblîs, 1954

5–Bo zanyarî zêtir birwane:

D. Kurdistan Mukiryanî, Tîşkêk le ser zimananî danîştûy konî Kurdistan (zimananî Xûrî û Urartî) ke le 23.04.1994 da le kirdnewey înstîtutî Kurdî le Berlinda pêşkêş kira

G.Diakonaff I.M. and Starostin S. A. Hurro Urartian asan easteren München, 1986

Hurro– Urartina as an easteren caucasian language. München, 1986


**DR. KURDISTAN MUKRIYANÎ**

## AWIR

### Herkes zimanzan e

Li ser rewşa zimanê kurdî gelek makale û nivîs têne weşandin. Hinek bi nêrîneke zanyarî hatine lêkirin, hinek ji wan jî, bi bêhntengî, li gorî hîsên xwediyê xwe hatine nivîsandin. Ez bi xwe dixwazim ji van nivîsên çewt jî moralekî bistînim.

Erê li welatekî serbixwe, pêşveçûyî nerinên dûrî hiş ne di cihê xwe de ne. Lê ev tiştê ku li ser dinvîsim zimanê kurdî ye. Heke îro kesên ne zimanzan jî bi awayekî jixwe bawer nerînên xwe bînin zimên, ev gaveke rind e. Em ber bi başiyê ve diçin. Helbet li welatê peşveçûyî şaxê zanyariyê, hunerê, çandê, ji hev hatine cudakirin. Her mirov di der heqê şaxekê de xwe digihîne. Di yek şaxê de pispor e.

Bêşik, xebateke modern ji me re jî pêwist e. Dive ku îro jî di hemû şaxên ziman, çand, huner, dîrok û hwd. de. mirovên zane derkevin û gel jî şiyar bikin.

Mirovên me hem siyasetvan in, hem zimanzan in, hem jî nezan in! Li gelek cihan, di civatan de, mirov dikevin qiriqa hev. Bi awayekî fanatîk, der heqê zimên de gengişiyê dikin. Yek dibêje: "Bêşik ev gotina ku ez bi kar tînim gotineke kurdî ye", yê din dibêjê "Na! Ya ku ez bi kar tînim gotineke kurdî ye." Mixabin gelek jî van dostan ne kurdiya Bakur, kurdiya qezaya ku lê dijîn, baş nizanin.

Ez ji ber kêmzanina van dostan, li wan nagirim. Belê, lomeyan li wan dikim. Tiştên ku şer ji bo wan tê kirin, xwîn ji bo wan tê rijandin, evqas zilm, zordarî û zehmetî ji bo wan tê dîtin, çima bi me ne şêrîn in.

Em çiqasî serê xwe bi xwendin û nivîsîna zimanê xwe re diêşînin. Me bi xwe, bi salan di dibistanên biyanî de xwendiye. Hêj zarokên me negihîştine penc salî, em haziriya şandina dibistanê dikin. Lê ji bo xwe..

Ku tê axaftin, mêr di ser me re nîn in. Em dikarin sê–çar saetan der heqê zimanê kurdî de bikevin qirika hev. Lê em zahmet nakin rojnameyekê bi kurdî bixwînin û bi zarokên xwe bidin xwendin.

Dema ku ev rexneya jorîn tê kirin, dibêjin. "Zimanê rojnameya Welatê Me giran e". Birayo! Te serê xwe pê re neêşandiye. Bi qasî ku te serê xwe bi tirkî re êşandiye % 20 wê bi zimanê xwe re jî biêşîne, emê binerin bê çawa tuyê wekî bilbil bixwînî.

De bila em hemû bi qasî zimanê ku niha rojnameya "Welatê Me" dixebitîne fêr bibin, çiqas pirsgirêkên zimanê me hebin jî ne xem e. Roj wê bê; zimanzan, pispor, dibistan, enstîtu, televîzyon, dê zimanekî xwerû xweş û delal diyarî me bikin....

**HESEN ZINAR**

# XANÊ Û XANÎ

**● Bi rastî jî, ji bilî Seydayê Xanî gelek hozanvanên kurd fekiyên wan zozanan in. Ji bo wê yekê tê gotin ku "Xanî" (Eşîra Xaniyan) hemû ji zikmakiya xwe şaîr in." An jî "Ew Xaniyê dengbêj nebe, ew ne yê babê xwe ye." Dihate gotin ku Xaniyan di nava hozanvanî û stranbêjiya devera Hekariya qedîm de cihekî girîng girtine.**

**● Ji ber hatin û çûna rêwî û karwanan, Xanê bi pêş ve çû û Xanî jî xurt û fireh bûn. Beriya 500 salan di nava siyaset û çanda herêma Culemêrgê de giraniya wan zêde bû, di nava biryarê Mîrê Hekariyan de bûne xwedan gotin û biryar.**

Ez jî wekî hemû kurdên welatparêz, pir pê kêfxweş û dilşad bûme ku ji aliyê hozanvan, zana, nivîskar û rewşenbîrên kurd ve sala 1995'an wekî sala Ehmedê Xanî hatiye diyarkirin.


Bi rastî Seydayê Xanî malê neteweya kurd e. Em ji wî re çi bibêjin û çi bikin hê jî kêm e. Heta ku em sax bin, em ji binê qenciyên wî dernakevin. Bîranîna îsal a serê rêkê ye, di pêvajoya pêş de emê gelek kombûn, civîn, cejn û pîrozbahiyên layiqî wî, pêk bînin. Di rojên xweş, geş û birûmetê de emê wî bikin taca serê hozanvanên dinyayê.

Ezê di vê nivîsê de bi zêdehî li ser gund û eşîra wî bisekinim. Xan ku der e? Xanî kî ne? Borîna Xanê û Xaniyan bi kurtî çawan bû? Reha ku ew li ser şîn bûye çi ye?...

Gundê Xanê, bi 40 km'yî li başûrê Culemêrgê dikeve û niha di nava tixûbê navçeya Çelê (Çukurca) de ye. Di wextê de ji ber hatin û çûna rêwiyan di navenda sê gundan de Xanek (baregeha rêwiyan) hate avakirin. Ji vê xanê re digotin, 'Xana sê gundan'. Di demeke kurt de gund, deşt û geliyên deverê jî, li şûna navên xwe, navê wê xanê wergirtin.

"Xanî", "Deşta Xanê", "Geliyê Xanê" niha jî bi van navan, ew cih û malbat têne binavkirin.

Deşta Xanê zozaneke bilind û bala ye. Doranê wê bi çiyayên Gare, Semedar (çelê duguh) û Rêjgarê ve hatiye dorpêçkirin. Avên ber keviyan ên zelal û cemidî, banî, dol û newalên di kêlekên deştê de têne xwar û li ser sîngê wê mîna marekî spî dibin gerî gerî.... Herdu aliyên çemî, mêrg û çîmen in, bi alal û asmîn, nêrgiz û beybûn, binevş û rihanan ve hatiye xemilandin. Di wî warê kevnar de havînan kew û kevok, şahlûl û bilbil, baz û başok mêvan in li rex gul û kulîlkan.



**Bavê fikra netewetiyî û nivîskarê destana kurdî ya neteweyî (Mem û Zîn) Ehmedê Xanî**

Neynika zeriyên şox û şeng, kaniyên zelal in. Bêrîvan keziyên xwe yên zer li hindava wê avê dihonin, biskên xwe li wir şeh dikin û çavên xwe yên belek li ser wan kaniyan kil didin. Xizêmên şor, guhar û belbiyên sor û zer li ber ronahiya binê kaniyê dixin difin û ber biskên xwe, xort porê xwe li ber wê zelaliyê şeh dikin, simbêlên xwe li ber wê ba didin. Baz û başok li ser serê çiyayê Gare, Rêjgar û Semedarî ref bi ref digeriyan. Goniyek nedima ku kewên nûhatî hêlînên xwe di bin de çênedikirin. Giya, gul û kulîlk bêhejmar in. Kul û kovana nêçîrvanan ew e ku lat û zinarên doranê Deşta Xanê çeperên xwe çêkin û zêrevaniyê ji pezê kovî re bikin. Barebara berxan û hohokên şivanan li zinar û berojan deng vedide. Zarok serê sibê li ber wan dengan ji xewa şîrîn hişyar dibin. Bi kurtî di Zozana Xanê de mirov xwe li nava geşt û seyranê dizane. Bi roj ve bêrîvanî, bi şevan li rex konên reş herdem govend û şahî ye. Cejna berxbirê û ya beranan (beranberdan) ber êvariyê dizivire festîvaleke herêmî. Aliyek şîlan, yek jî govenda mêr û jinan e. Berxevan pêtekên xwe (berxên heqê destê wî) li ber awazên dengbêjan dibijartin, li ser wan cejna dilşadî û pîrozbahiyê stranên nû dihatin çêkirin. Bêrîvanên keç û kur, di rêka bêriyê de ramûsan didan hevdu, destmal, gustîl û diyarî di wan meşan de didan hev û bi hev diguherandin.

**Hin kes di nivîsên xwe de dibêjin "Ehmedê Xanê." Ev xelet e. Paşnavê wî ne navê gundê wî ye, navê eşîra wî ye, yanî Ehmedê Xanî ye.**

Ev çend gotin in, ji jiyan û rewşa ji borîna zozaniyê . Deşta Xanê di herêma Hekariya de zarokekî bijare, delal, şîrîn û spehî ye. Wê xweşî û rindîtiyê gelek bandor li xwecihiyên deverê kiriye û bûye îlhama hozanvanî û dengbêjiyê. Ji ber wê yekê



Ziyaretvan li ser gora Ehmedê Xanî kêm nabin.

kurdnasê nemir Sadiq Bahaddin Amedî di Pirtûka pertew Begê Hekarî de ji bo herêmê dibêje: "Ew cih suruşt, rengîn bi deşt û gol û havîngeh û zozan bûye. Ew cih warê zanist û toreya klasîka kurdî bûye."

Bi rastî jî, ji bilî seydayê Xanî gelek hozanvanên kurd fekiyên wan zozanan in. Ji bo wê yekê tê gotin ku "Xanî" (Eşîra Xaniyan) hemû ji zikmakiya xwe şaîr in." An jî "Ew Xaniyê dengbêj nebe, ew yê babê xwe ye." Dihate gotin ku Xaniyan di nava hozanvanî û stranbêjiya devera Hekariya qedîm de cihekî girîng girtine.

Şîva (gelî) Ertûş û Pinyaniş, Tixûb û Tiyarê, Cêlo û Bazê Deşta li Xanê digihên hev. Berê riya herêma Hekarî û Behdînan jî di nava Xanê de diçû

Hin kes di nivîsên xwe de dibêjin "Ehmedê Xanê." Ev xelet e. Paşnavê wî ne navê gundê wî ye, navê eşîra wî ye, yanî Ehmedê Xanî ye.

Me li jorê bêhsa xweşî û bêhnfirehiya zozanan dikir. Ew kesê ku evîndariya xaka welat û mirovan, gulan, kulîlkan di serî de hebe û di Zozana Xanê de bijiya, an wê bûbûya aşiq û dengbêj, an jî hozanvan...

Ji ber hatin û çûna rêwî û karwanan, Xanê bi pêş ve çû û Xanî jî xurt û fireh bûn. Beriya 500 salan di nava siyaset û çanda herêma Culemêrgê de giraniya wan zêde bû, di nava biryarê Mîrê Hekariyan de bûne xwedan gotin û biryar.

Kurd dibêjin "Her giya li ser rehên xwe şîn dibe." Pêxemberê diyaneta me ya millî" Ehmedê Xanî li ser wî bingehî û di nava wê bihuşta li nav çiyan de hate dinyayê. Kurê Şêx Îlyas, Şêx Îlyas jî kurê Rustem bû. Zulm û zordariya Mîran, bêtifaqî û dubendiya eşîran li wir baş dît. Di 14 saliyê de dest bi nivîsê kir.

Xuya ye ku ev rêzik hê ku li Hekariyê mişext nebûye nivisîne.

*Mîrê ku bi navê mîrîza ye*

*Mehza nezera wî kîmya ye*

Seydayê rewşenbîr M.Emîn Bozaslan dibêje ew Mîrza Mîrê Hekariyê ye.

Di çaxa pisporiya wî de Eşîra Xanî (eşîra wî) hilweşîneke mezin derbas kir. Di navbera waliyê Wanê û Mîrê Hekariyê de şer çêbûye. Ezemşêrê Xanî li Kela Wanê, paşayê Osmaniyan da ber xenceran û ew kuşt. Li ser wê bûyerê dijminahîya Osmaniyan zedê bû. Mîrê Hekariyê jî li dijî wê neyariyê ranewestî û xiyanet kir. Xanî gişt koçber bûn. Hîn çûne bajarên deverê, hin jî debasî Şamê bûne.

Li ser mêrxwasiya Ezemşêrê Xanî ya li hemberî kedxwerên Osmaniyan stran hatin çêkirin. Niha jî ew stran li govendên Culemêrgê hê jî têne gotin. Ez dixwazim ji ber kevnariya stranên kurdî, çend bendên wê stranê ya ku beriya 350 salan hatiye gotin ji xwnedevanên hêja re bikim diyarî.

**EZEMŞÊRÊ XANÎ**

*Hel meydanê meydanê*
*Ezemşêro meydanê*
*Du siwar hatin lêdanê*
*Kes naxwaze emanê*

*Ezemşêro tu Xanî*
*Berxo, berxê beran î*
*Cengê paşa deranî*

*Kela Wanê birîne*
*Lê digerin dû şahîn e*
*Ezemşêr, Aledîn e*

*Kelata Wanê tat e*
*Ezemşêr jor da hate*
*Roman kire xebat e*

*Kemera paşa Wan e*
*Destê Ezemşêr Xanê*
*Digera sûk û dikanê*

*Kemera paşa zêr e*
*Destê Ezemşêr pê ra*
*Gêra sûk û bejêra*

*Ezemşerê tu Xan î*
*Tu berxê ber beran î*
*Cengê paşa deranî*

Bi koçberiya Xaniyan binemala Seyidan jî derbasî Nûrdizê bûn (Nûrdiz li bakura Hekariyê û li ser Şaxê ye). Bavê wî Şêx Îlyas li gundê Sêvkê çû ser heqiya xwe. Tê zanîn ku Seyda, xwendina xwe bi pêş ve biriye, derbasî Cizîra Botan bûye û pişt re jî çûye aliyê Bazîdê.

Seydayê Xanî xwendineke baş dîtibûye. Ji bilî kurdî; erebî, farisî û tirkî jî baş dizanibû,. Ji ber ku ziman, çand û wêje ya wan dizanibû wî hersê dijminên kurdan ên hov jî baş nas dikirin. Ji bo wê dîtina kûr û feylesofî, der heqê wan hersê kedxwar û dagirkeran de ev rêzikên ku bi tîpên zêrî ve hatine nexşendin, çêkirin û ji bo zarokên kurdan ên ku îro li hemberî wan xwînmij û talankeran lehengiyê dikin, kire xelat:

*Ger hebûya me îtîfaqek*
*Vêra bikira me înqiyadek*
*Rom û ereb û ecem temamî*
*Hemiyan jî me ra dikir xulamî*

Lê mixabin ev 300 sal di ser wan gotinan re çûn, hê jî gelek patîxwar, xayîn û xwefiroşên kurd ew kirasê kemasiyê û qirêj girtî ser laşê xwe yê bêar û bêxîret, neavêtin û hez dikin her ew xulamên xulaman bin. Pirsa esil û biniyeta xwe nakin, ereb, fars û tirkan efendî, xwe kole dibînin. Nizanin ku sedemê wê koledariyê bêtifaqên fihêt, şermezar û rûreş in. Hozanvanê zana berî sê qirnan jî neteweya kurd camêr, merd û cengawer dizanbû û digot:

*"Her mîrekî wan bi bezlê Hatem*
*Her mêrekî wan bi rezmê Ristem"*

Ronahî daye gelê kurd û xwestiye ku wan ji xewa giran hişyar bike û wan bîne rêza neteweya azad û serbixwe.

Pesnê Seydayê Xanî û gotinên wî yên li ser kurdan û bindestiyê dikarin gelek rûpelên kovar û rojnameyan tijî bikin.

**Î. CULEMÊRGÎ**



**Tirba Ehmedê Xanî di van salên dawî de bi alîkariya gelê herêmê hatiye avakirin.**

# DEFTER

## Kilkirin û korkirin

Van rojên rabûrî, bi serperiştiya PKDW'ê û bi pişikdariya gelek sazûmanên kurdî, tevgereke berfireh ya bi navê "Kampanyaya bi kurdî bipeyive, bi kurdî bixwîne û bi kurdî ramana xwe bike" dest pê kir.

Ji bo birêvebirina vê tevgerê jî, ji layê Enstîtuya kurdî ve bernameyek ku ji 5 bendan pêk hatiye, mîna belavokekê hatiye amadekirin. Di vê belavokê de hindek peyv ne di cihê xwe de hatine bikaranîn.

Min divêt bidim xuyakirin, ji ber ku ev sazî di jiyana me ya kurdewarî de cihekî girîng digire, bi zanayî ev nivisîn, wekî 'renge rexne' ji bo vê sazûmanê hatiye arastekirin. Heger na, nimûneyên bi vî rengî di tevahiya weşanên kurdî de mişe ne. Piştî vê daxuyakirinê , ez dixwazim yekser derbasî babetê xwe bibim.

1- Peyva 'term', ango bêje: Ev peyva ku ji zimanê latînî hatiye, di zimanê kurdî de ji bo giyanê mirovan yê bêcan, yê mirî tê bikaranîn. Ji bo nimûne:. "Termê Mîrê Xerzan maye li bin baranê" û berdewam.

Lê, li şûna vê peyva ku di du zimanan de watiniya wê ji hev cuda ye, bikaranîna peyva kurdî "bêje" yê li şûna 'term'a latîniyê, di nêrîna min de wê hîn baştir be.

2- Peyva 'qinik' , ango dîlok-dilok: Li seranserî Kurdistanê, ji bo navika gwîzê û ya behîvê, yan "qinik", yan jî "kakil" tê gotin. Helbet, peyva kakilê ji peyva qinikê berfirehtir e. Qinik, bes ji bo navika gwîzê û ya behîvê tê bikaranîn. Lê kakil, ji bo navika her meyweyekê û ji bo naveroka her babetekî tê bikaranîn. Lê di belavoka navbirî de ev peyv, li şûna 'tekerleme'ya tirkî û li şûna (dîlok)a kurdî hatiye bikaranîn.

3- Peyva 'pergal ': Dibe ku li bîra me gelekan be. Gava ku zarokekî (nemaze li gundan) digel hevalên xwe dileyist, xwe gemarî dikir û dihate malê, li hemberî vê bêser û berîya wî zarokî, dayika wî : "Lawo tu çi bêpergal î" yan jî "Ma çima tu hewqas bêpergal î" digot.

Di vê mînakê de jî baş diyar dibe ku peyva 'pergal'ê, heger bi durustî cihê 'nîzam' a erebî yan jî, cihê 'düzen' a tirkî negire jî, belê ne dûrî naveroka wan jî ye. Lê vê peyva 'pergal' ê di belavoka navbirî de li şûna 'araç-gereç'a tirkî û li şûna 'alav û malav' a kurdî hatiye bikaranîn.

Encam. Ez bi xwe ne li dijî afirandina peyvan im ,lê li dijî veguheztina cih û watiniya peyvan im. Peyva ku wê bê afirandin jî, divêt bi hûrbînî û bi pêjinkerî li dûv suruştiya kurdî be. Divêt neyê jibîrkirin ku peyva ku îro bi şaşî û çewt bê bikaranîn, bere bere wê di nav rewşenbîr û xwendevanan de cihê xwe bigire û piştî çend salên din wê bibe egerê sergêjiyeke mezin û her wisa wê bibe egerê lawazî û belengaziya zimanê kurdî. Bi vî şêweyî zimanê kurdî dewlemend nabe, lê jar û belengaz dibe!

Ji bilî vê jî, dewlemendkirina zimanekî; ne bi çêkirina peyvan yan jî bi cih veguheztina peyvan e. Bi taybetî zimanekî mîna zimanê kurdî, ne hinde jar û belengaz e ku pêdiviyê afirandineke wisa bêser û ber be. Ez dixwazim bi metelokeke kurdewarî gotina xwe bi dawî bînim.

...Li gund govend e. Li aliyekî govendiyan dîlana xwe germ kirine û li aliyekî jî berbû bûka xwe dixemilînin. Yek ji berbûyan jî kildank û kilçîvkê xwe derdixe û dest bi kilkirina çavên bûkê dike. Jinik kilçîvkê xwe li dora çavên bûkê dibe û tîne. Çima carekê bêdestiyê nake û kilçîvkî di çavekî bûkê re ranake û reşka çavekî bûkê dirijîne. Vêca jinika berbû li xwe dixe û dibêje: "Weyla li min rebenê; min got ezê bi kilkim, lê min kor kir."

**DILDAR ŞEKO**

# Pelek ji paşeroja jiyana zarokên kurd

Her jineke kurd di temenê xwe de bi kêmasî neh–deh zarok dianîn gerdûnê. Ji sedî çilê wan dimirin, tengasiyên mezin hebûn. Hê jî, ji bo kurdan xwarinên (tamatî) bingehîn ev in: Toraq, arvan, rûn, şekir û xwê. Yekî ku xwediyê van be kêfa wî tirîngoz e.

Ji ber gelek sedeman dayik bêfêm diman. Bi awayekî çewt zarok mezin dikirin. Derfetên ku hebûn jî nedinirxandin. Mînak: pirî caran loqim dixistin nav paçikan û didan devê dergûşan, dergûş ji şewatê dimirin. Piraniya zarokan hingî bêxwedî diman hînî xwarinê dibûn.

Zarok çi dema pê li şeş saliyê dikir, bi şevê bi tenê dihatin mal. Zivistanan mal dikirin rêzê, her şevê li malekê diciviyan, bi gotina çîrokan bereberî saz dikirin.

Di axaftinên rojevê de hinekan pesnê xwe didan û "Em kurd deh, penzdeh zarokan, tî û birçî, tazî û pêxas berdidin askoran. Zarokên me di gemariyê de mezin dibin, tiştek bi wan nayê" digotin. Sedemên vê ne kurdbûna me ye; xweşbûna welat bi hezaran cure giya tê de şîn dibin, ava zelal, bayekî xweş heye. Xwarinên kurdî, ji xwarinên bingehîn çêdibin.



**Zarokên me wê roj were welatê xwe ji wê rewşa xerab rizgar bikin.**

Zarokan ji pevçûnê pir hez dikir, serû diranên hevdû dişikandin. Lewra di nav malbatan de jî pevçûnên herî mezin hebûn. Çi wexta ku laşê me biteviziyana, li me dikeliya û cemedê peqik didan.

Di zarokaniya xwe de, me cih di civata mezinan de bigirtana ji bo me şahiyek mezin bû. Lewra wan yekî efsane û çîrok digotin, bûyerên dîrokî dinirxandin. Zarokê ku sêwî bimana ji bo wan ezabekî mezin bû. Diketin bin baskên damariyê (jinbav). Sêwîtî di jiyana kurdan de êş e, bêkesaniyet e, belengazî û bêrûmetî ye. Zarokên sêwî ne serbest bûn, di nava zarokên din de stûxwar bûn, damariyan xwarinên jî baş nedidanê. Ne bêsebeb ji jinbavê re damarî tê gotin.

Zarokên lawîn piçekî dîtir baş dijiyan. Ê qîzîn di jiyaneke agirîn de mezin dibûn. Min bixwe bi hezaran caran ev gotin ji devê jin û keçikan bihîstiye : "Rêx di nav jiyana me de be, eh!"

Zarokên me beşek ji roja welatê me ne. Bibawer û hêvî me ku wê di paşerojê de zarokên kurd wilo çeng biavêjin gerdûnê û ewê her cihê baş û pêşketî ji xwe re bikin, îro cemed dihele...

**JÊHAT GIMGIM**

# NAMEYÊN XWENDEVANAN

### Rûmetî û bêrûmetî

Gelî xebatkar û xwendevanên hêja ez we hemûyan bi daxwaziya jiyaneke paqij, azad û birûmet silav dikim û di tekoşîna we ya mirovaniyê de daxwaza serkeftinê ji we re dikim.

Hevalên hêja, hûn jî dizanin ku vê dema em tê de ne, demeke pir dijwar e. Ji bo nirxê pîroz ê mirovaniyê, hemû mirovperwer û azadîxwazan serê xwe dane pêş. Keç û xortên mîna berxikan singên xwe ji guleyên dijminê xwînxwar re kirine çeper. Agirê jiyana azad bi canên xweyî şêrîn vêxistine. Li hemberî van daxwaziyên mirovane, dijminê xwînxwar roj bi roj hovîtiya xwe zêde dike. Bi kurtî mirovatiyê li dijî nemirovatiyê têkoşîneke bê hempa daye. Roj, roja xuyakirina rêza rûmetdariyê û ya bêrûmetiyê ye. Êdî, ew riya ku bi "riya navîn" tê zanîn, îro nemaye. Êdî rê ji hev cuda bûne. Hinek mirovan riya qenciyê û ya başiyê girtiye. Ji bo azadî û serxwebûnê, heta mirinê hemû tişt raserî çavên xwe kirine. Hinekan jî, ji bo daxwaz û karên xwe yên nebaş û biqirêj cila bêrûmetiyê û rûreşiyê avêtine ser çavên xwe. Xwe kirine hevparên sûc û gunehkariyên mirovatiyê. Ji bilî van her du riyan, riya sêyemin tune ye. Yan alîgiriya birûmet, an jî ya bêrûmet.

Ji ber ku em jî dibêjin em mirov in, me şîrê paqij metiye, lewra em jî di nav rêzên mirovatiyê de cihe xwe digirin. Tu caran nayê ji bîr kirin ku jiholêrakirina van xwînxwaran, girêdayî tekoşîna me ya li hemberî wan e. Roj bi roj bilindbûna dengê hebûna mirovatiyê, wê bibe dengê xirîna mirina wan. Dîroka mirovatiyê hemû deman daye xuyakirin ku yên xwînxwar, di xwîna ku rijandine de hatine fetisatin. Serên wan di bin lingên têkoşerên azadiyê de hatine perçiqadin, serkeftin û serfirazî bûye ya mirovperwer û azadixwazan.

Gelî hevalan, hîn tiştên ku wê werin nivîsandin pir in. Lê vê gavê ji we re dibêjim: "Bi xêr û xweşî biminin.

**Mûradê Surucî**
**Qeyserî**

### Ji bo jiyaneke bi rûmet

Jiyana mirovan jiyaneke pir buha ye. Lê tiştên ku wê jiyana giranbuha dike, nirxên mirovahiyê ne.

Mirovên ku li nirxên xwe yên mirovahiyê xwedî dernekevin, jiyana wan jiyaneke bêrûmet e.

Di dema îro de jiyana me kurdan divê jiyaneke birûmet be, ev jî bi xwedî derketina nirxên me yên neteweyî ku ew jî ji nirxên mirovahiyê ne, pêk tê.

Ev nirxên me hemû bi xwîna şehîdan û têkoşîna şervanên me hatine damezirandin û bidestxistin.

Eger em li van nirxan xwedî dernekevin wê çaxê, wê jiyana me jî jiyaneke bêrûmet be.

Gelê me, îro di demeke pir dijwar û riyeke tijî zor û zehmet re derbas dibe, dijmin ji çardorî me ve êrîş dike, hemû çek û metodên xwe yên hovane li dijî gelê me pêk tîne. Dixwaze ku van nirxên me yên bidestxistî biherifîne û kesatiya gelê me dîsa bide bin piyan, ji bo avakirina welatekî serbixwe û azad, ji bo mirovahiyê û demokrasiyeke rast, ji bo jiyaneke bi rûmet werin em tev de li dijî vê zilm û zordariyê, li dijî şerê qirêjî bibine yek kulm, ji ber ku ev şer şerê hebûn û nebûnê ye.

**Remezanê Hûrî**

### Biratî lê çawa?

Xebatkarên Welatê Me ez ji we re bi can û dil silav dikim û ji serkeftin û sipasiyên xwe pêşkêş dikim. Ji ber ku di bin wan zilm, zor û zehmetiyan de hûn rojnameyeke bi zimanê dayika min î şîrîn derdixin. Her cara ku ew digihîje destê me, wekî ku rojeke nuh li min hilê, wekî mîrasek bigîhîje dest min. Hûn çiqas zehmetiyê dikişînin, ez jî li Ewrûpayê li ser rûdinim, di rehtiyê de dixwînim. Gelî hevalan ez xwe sûcdar û deyndar hîs dikim. Ez ji welatê xwe zehf hez dikim. Heftiya ku rojnameya me nekeve destê me, em xemgîn dibin.

Bila tirk banga Serok rind bifikirin; ev deh hezar sal in em xwediyê vê axê ne, me bi tirkan re tev ev welat çêkir, em bi hev re mirin, dîsa me bi hev re serkeftin bi dest xist, me bac da wan, ji bo wan me li Qibrisê leşkerî kir. Bila tirk baş bifikirin; me ji bo almanan tiştek nekiriye, almanan ji bo zarokên me dibistan vekirin. Me ji bo îngilizan qet tiştek nekiriye, wan ji me re televîzyon vekirin. Me ji Holandayê re tiştek nekir, cih dan parlementoya me. Tirk jî van tiştan, tiştekî nakin û dibêjin: "Em biran e." Ev çawa biratî ye? Bi rovitî û hovitiyê tu car mesele hel nabin.

**M. Alî Heste**

# Ji Welatê Me

SAMÎ TAN

## Kurd qedera xwe bi destê xwe dinivîsin

Diyarkirina mafê çarenûsê, ji bo gelekî, tiştekî jênager e. Her gel, her netewe bi xebata xwe, keda xwe û bi çalakiyên xwe qedera xwe tayîn dike. Gelê ku qedera xwe bi dest xelkê ve berdide, dibe pêlîstikê xelkê, bi her awayî ji gelbûnê, ji neteweb ûnê, heta ji mirovahiyê bi dûr dikeve. Gelê kurd jî berî şerê azadiyê bi her awayî xwe bi dest dijminên xwe ve berdabû, wan jî li gorî dilê xwe pê dilîst. Amadekariya tunekirina gelê me dikirin, lê şerê azadiyê hemû plan û tevdîrên wan serûbin kirin.

Niha gelê kurd êdî bi ser xwe ve hatiye, ne rojeva xwe bi tenê, rojeva cîhanê bi livbazî û çalakiyên xwe tayîn dike. Ji 14'ê tîrmehê bi vir ve dîlên azadiyê bi çalakiyên xwe dengê xwe gihandin seranserî dinyayê. Dîlên azadiyê bi daxwaza aştiyeke bi rûmet, ji bo bidestxistina mafê dîlitiyê û hinek daxwazên gelê kurd ên însanî, dest bi greva birçîtiyê kirin. Vê çalakiya wan a mafdar di nav gelê kurd de, li hundir û li derve deng veda. Tu xebat bêberdêl nabin, wa ye ji niha ve du welatparêz (yek ji girtiyan, yek jî li Ewrûpayê) şehîd ketine.

Her çiqas hinek şûrkêşên çapemeniya tirk guhê xwe ji rastiyan re bigirin, an berê rastiyan biguherînin jî, dengê dîlan gihîşt seranserê dinyayê. Mirovên aştîxwaz û mirovperwer bi piştgiriya xwe mafdarbûna dîlan teyîd kirin û guh nadin vir û derewên dewleta tirk.

Xwendevanên hêja, di hinek waran de rexne û pêşniyarên we digihîn destê me, li gorî îmkanên xwe emê wan li ber çavan bigirin. Wek mînak hinek xwendevanên me ji me dixwazin ku em zêdetir cih bidin nivîsên li ser çanda kurdî, jiyana civakî û nûçeyên şîroveyî. Belê hinek xebatên me li ser vê yekê hene, di rojên pêş de emê di van waran li gorî daxwazên xwendevanan hinek guherînan pêk bînin.

Hefteya çûyî di nivîsa Rojhat Azadî de hinek çewtî çêbûbûn. Birêz Rojhat li ser vê yekê em agahdar kirin, lewre em spasiyên xwe pêşkêşî wî dikin û ji nivîskar û xwendevanan lêborîna xwe dixwazin, emê bi baldarî li ser vê mijarê bisekinin.

Xebatên li ser belavkirina bi destan zêdetir bûn, lê dîsa jî em ji xwendevanên xwe dixwazin ku heta ji destê wan bê, rojnameyê ji bayiyan bikirin. Di vî warî de jî hinek xebatên me hene, em bawer in hûnê karibin bi hêsanî rojnameyê ji bayiyan temîn bikin. Bi nûçe, şîrove û gotarên cur bi cur rojnameya xwe xurtir bikin.

## Gundê me gazî me dikin

Silavên jidil û germ, serfirazî û pêşketinê ji rêvebir, xebatkar û xwendevanên Welatê Me û ji hemû gelê me re pêşkêş dikim.

Min divê ez behsa gundê me ji we re bikim. Gund li herêma Botan, li ser navçeya Dihê (Eruh) ye. Navê gund Torîk e. Beriya du salan çend xanî hatin şewitandin û ji ber nepejirandina cerdevaniyê gund hate valakirin. Xelkê gund koçî bajarên Kurdistanê û Çukurovayê bû.

Çima ezê behsa gund bikim? Lewre ev gund jî wekî hemû axa Kurdistanê di dilê min de zehf qedirbilind e. Wan rojan di xewna de ez bi gelek kesên nas re diçûm gund. Li ser kêfxweşiya vê xewnê, min xwest ez delalî û serpêhatiya vî gundî diyarî xwendevanên Welatê Me bikim.

Em di nava malên gund, di nav dehl, rez, bostan û zeviyên gund de dimeşiyan. Em gelek dilşad û bextewar dibûn û me ji hev re qala xweşiya gundan dikir. Dilê me bi hev tijî evîn û hezkirin dibû, evîna welêt di nava dilê me de dikeliya.

Ez şeveqê rabûm, min dît ku ez li Enqereyê me. Hêrs û nefreta dijmin di dilê min de gir bû, mezin bû û gund û derdora wî tev di ber çavên min re derbas bûn, lê zimanê min têrî qisekirina ji Torîk nake. Hema ez dikarim bibêjim ev gund bi serê xwe bibe dewletekê, bi hatinên xwe yên cur bi cur dikare xwe xweyî bike; Ji genim, ceh, birinc, nîsk, kuncî bigire, heta bacan, qehwe, îsot, petêx û fasuliyan. Ji goz, fistiq, behîv, tirî bigire, heta ribêz, sohyaz, kereng, sêv, xox, mişmiş, kizwan... û gelek cure narinciyan, fêkî, pincar tê de digihîşt. Di sê aliyên gund de av û robar diherikiyan, li nava gund jî zêdeyî 7–8 kaniyan hebûn.

Gund pala xwe dabû Çiravê, berê xwe dabû Herekolê, ji aliyên din ve jî li Cudî û Gabarê dinêriya. Dora gund dehl û daristan, çiya û zozan bûn. Li ser çiyayê Çiravê tu demên salê berf xelas nedibû. Mêşên hingiv, pez, dewar, mirîşk bi zêdehî dihatin xweyîkirin.

Wan salên dawî, di gund de danûstandineke baş hebû, ji xwe tu caran di nava gundiyan de kuştin û dubendiyên dûvdirêj çênebûbûn. Lê xweşiya van salên dawî pir zêde bû. Min ji sala 1981'î pê ve dest bi xwendina li derveyî gund kiribû. Ez her dem ne li gund bûm, lê belê dema carinan ez diçûme wê derê, min qencî, başî û delaliya gund û gundiyan didît, ez pir kêfxweş dibûm. Newroz û sersala gund bi girseyî, tevahî, dilşadî dihat pîrozkirin. Newroza 92'an ez li gund bûm. Pîr û kal, jin û mêr, zar û zêç tev hatibûn meydanê, bi hev re digotin: "Canê canê emê rizgar bikin Kurdistanê."

Mixabin niha ev gund xir û xerabe, wêran e. Avahiyên gund jî hatin xerakirin. Lê heyf û tola gund û xwezahiya Kurdistanê têye standin. Serfirazî, silavên germ dîsa ji hemû gelê me re pêşkêş dikim.

MELÛL BOTANÎS

## FERHENGOK

**Alozî:** Tevlîhevî, rewşa nediyar (Rewşa dewletê aloz e)
**Asteng:** Manî
**Berhingarî:** Pêşlêgirtin
**Binecih:** Xwecih. (Gelê kurd ji roja rojîn de li zagrosan û li Mezopotamyayê binecih e)
**Berik:** Mermî
**Buse:** Kemîn
**Daristan:** Deverên têr dar û ber
**Demhejmêr:** Saet
**Desthilatdar:** Xudanhêz, serdest
**Gerok:** Mirovê ku digere
**Gorepan:** Meydan, panav
**Herêm:** Dever, ev peyv di zimanê botonîk de, bêhtir li şûna iklîmê tê bi kar anîn
**Tewr:** Tutum
**Hêzên asmanî:** Hêzên leşkerî yên hewayî
**Keleper:** Hûrik û mûrik
**Kolewar:** Kesê kole
**Mangirtin:** Rojî, greva birçîbûnê
**Moşek:** Roket
**Moşekhavêj:** Maka roketê, ya ku roket pê tê avêtin
**Noker:** Kesê xwefiroş, ê ku xiyanetê dike
**Pêşewa:** Lîder, serok, pêşewayê (Komara Mihabad Qadî Mihemed e)
**Pêzanîn:** Agahî malûmat
**Rasipartin:** Teslîmkirin
**Rêving:** Rêwî
**Senger:** Kozik, qereqol
**Serleşker:** Kesê ku serkêşiya leşkeran dike, fermander
**Teqemenî:** Cebilxaneya leşkeran, tiştên ku diteqin
**Vekêşan:** Dirêjkirina babetekî (Şerê di navbera du hêzan de şevekê vekêşa)
**Vîn:** Îrade
**Zeripoş:** Panzer
**Zîl:** Cemse trumpêla ku leşkeran bar dike


## AGAHIYÊN ABONETIYÊ

**Min Welatê Me Divê**

| | | Li Hundir | Li Derve |
|---|---|---|---|
| ☐ | 3 Meh | ☐ 550.000 TL | ☐ 45 DM |
| ☐ | 6 Meh | ☐ 1.000.000 TL | ☐ 80 DM |
| ☐ | 12 Meh | ☐ 1.800.000 TL | ☐ 150 DM |

**Bedelê Abonetiyê ez radizînim**

**Li Tirkiyê** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264–1

**Li Derve** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507–3

**NAV Û PAŞNAV** : ....................
**NAVNÎŞAN** : ....................

**Navnîşana Welatê Me**
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
**Tel–Fax:** 293 53 19 – 293 53 20



**WELATÊ ME**

Rojnameya Hefteyî
**(Haftalık Gazete)**

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
**Aynur BOZKURT**

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)
**Sami TAN**
**Suut KILIÇ**
**Aynur BOZKURT**

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazışleri Müdürü)
**Metin AKSOY**

**NAVNÎŞAN (Adres)**
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

**TEL–FAX**
293 53 19 – 293 53 20

**ÇAPXANE**
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

**NÛNERÎ**
(Temsilcilikler)

**Suriye–** Jan Dost
Fener Rojbiyanî
**Berlin–** Silêman Sido
Sîrwan Reşîd
49-30-69 00 26 95
**Hannover–** Selîm Biçûk
49-5721-813 60
**Hamburg–** A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
**Munchen–** Mahmut Gergerli
49-871-670 884
**Badenwurttenberg–** A. Rahîm Ayaz
49-75453258
**Amsterdam–** Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
**Parîs–** M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
**Atîna–** Ferhan Zêbarî
30-13634905
**Bruksel–** Medenî Ferho
32-16-49 07 67




www.arsivakurdi.org

## Di şahiya Komeleya Pîr Sultan Abdal de Koma Zarokên Agirî (NÇM):

# 'Gel bira ne, bila şer bisekine'



**Roja 22'ê tîrmehê, li Stadyûma Ali Sami Yen a Stenbolê, Komeleyên Çandê yên Pîr Sultan Abdal şahiyek bi navê "Özde, sözde sazda bir olalım" (Bi dil û deng û tembûra xwe em bibin yek ) çekirin. Nêzîkî 10 hezar kesî beşdarî vê şahiyê bûn. Ji bo şahiyê, HADEP'a Stenbolê jî di nav de gelek saziyan (Umut FM, Kedkarên Belediya Eminönü û hwd.) mesaj şandin. Şahiyê ji nîvro heta êvarê dewam kir û di şahiyê de gelek komên muzîkê (Grup Yorum, Grup Munzur) û gelek komên govendê beşdar bûn.**

Rojek xweş û germ ji yên havînê, li Stadyûma Ali Sami Yenê bi şahiyeke ku dilê mirovan hênik dikir, dihat xemilandin. Li şahiyê kî tune bû? Gelek kes û komên muzîk û folklorê hebûn. Li Stenbolê şahiyên bi rengî, ne pir in, lê hene. Yek ji van jî di 22'ê tîrmehê de çêbû. Komeleyên Çandê yên Pîr Sultan Abdal bi navê "Özde, Sözde, Sazda bir olalım" şahiyek li dar xistin. Saet li yekê nîvro amadekarî qediyabûn û bi hezaran kes, êdî ji bo şahiyê amade bûn.

Gelek komên muzîkê, Grup Yorum, Grup Munzûr bi stranên xwe, temaşevan xistin nava coşê. Li aliyekî din komek zarok derketin seheya şîn. Bi timtêlên renga reng, bi hirbî û paçikên kesk û sor û zer, seheya topê dixemilandin. Navê wan, Zarokên Agirî bû. bi starana "Halklar kardeştir" (Gel bira ne) dest bi programa xwe kirin. Vê koma Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) daxwaza rojevê jî dianîn ziman. Ji ber ku li girtîgihan û li gelek deverên din bi hezaran girtî, malbatên wan, welatparêz û kesên din, ji bo bicihbûna aştiyê û sekinadina şer, ketibûn rojiya birçîbûnê. Zarokên Agirî jî, bi starnên xwe, wekî ku dixwestin qala aciliyeta vê meseleyê bikin, bi staranên xwe, wê rojê li Stadyûma Ali Sami Yenê, di nava dilê Stenbolê de şerê kirêt lanet dikirin. Rojeke din a havînê dibuhurî, zarokan tevî beşdaran, dixwestin mesajên wan derkeve derveyî stadyûmê û bigihîje her derê vî welatî. Şahî bi çoşeke mezin di di 8'ê êvarê de qediya.

CEWDET QÛŞMAN



**Koma Zarokên Agirî, di şahiyê de bi stran û lîstikên xwe bal kişandin ser xwe. Bi derketina komê, hemû temaşevan û beşdar rabûn ser piyan û bi slogana, "Bijî yekîtiya gelan" ew silav kirin. Zarokên Agirî, di bernameya xwe de stranên "Helebçe, Serê malan darek lê û Halklar kardeştir (Gel bira ne)" gotin.**

*elinewêrek*

